

Bêdengiya berî bahozê

Piştî şerê Başûr, dewlet bi hemû hêzên xwe ve, dest bi operasyoneke "hundirîn" kir. Di vê hêrekatê de, hedefa wan ya herî mezin valakirin û talankirina gundên Kurdistanê ne. Gel koçber dikin, birçî dihêlin û beyan dikin ku dê li herêmê dest bi qirkirinan bikin.

Gelê Kurd jî, li gor van amadekariyên dewletê, bi hêza xwe ya çekdar ve amade ye. Dê hêzên dewletê hîn bibin ku Kurd, ne Kurdên berê ne, Kurdistan jî ne Kurdistanana berê ye. Êdî qetliam çare nîn e. Lê dewleta Tirk heta di xwînê de nefetise, vê rastiyê nabîne.

Rûpel 8

DI VÊ HEJMARÊ DE

Gundek û eşîrek
li bakurê
Kurdistanê

Rûpel 6


Bi Dilgeş re
hevpeyvîn

Rûpel 11



Divê Zola çawa
bê nîrxandin?

Rûpel 13



Vekolanên
li ser Kurdî

Rûpel 10



REWŞ



Abdullah Keskin

Dîtinên xwe binivîsin

Welat gihîşt hejmara 44'an. Welat di 22'yê Sibatê de dest bi weşanê kir. Ev nêzîkî salekê ye ku bi periyodeke hefteyî her hejmar di wextê xwe de derdikeve. Li dijî kêmasî û zehmetiyan li gelek derve wêlê û derveyî wêlê belav dibe.

Ji bo rojname an kovareke Kurdî derketina periyodîk qistasekî bingehîn e. Wexta ku ev weşan xwerû bi Kurdî be ev qistas girîngtir dibe. Li dîroka rojnamegeriya Kurdî binêrin ji rojname û kovarên ku derketine ji sedî çend xwerû bi Kurdî ne? Bi çi periyodî derketine û çend salan dom kirine, tîraja wan çi qas e? Çend rûpel in û naveroka wan çawa ye?

Ger mirov dîroka rojnamegeriya Kurdî bide berçav, Welat ji niha ve rekorek şikandiye. Di rewşa îro de ji bo gelekî ku bi milyonan nufûza wî heye 2-3 rojname an kovar şerm e.

Ji Ukrayna heta bi Amerîka, li

hemû welatên Ewrûpa xwendevanên me hene û li her çar parçeyên Kurdistanê rojname belav dibe. Ji bo daxwazên xwendevanên xwe bi giştî em bînin cih em dixwazin rûpelên rojnameyê zêde bikin. Di salvegera Welat a yekemîn de rojname wê bibe bîst rûpel. Berî vê guhertinê em dixwazin pêşniyarên nivîskar û xwendevanên xwe bipirsin.

Em dixwazin şiklê Welat ê nû bi xwendevanên xwe re çêbikin. Dî-

Ji Ukrayna heta bi Amerîka, li hemû welatên Ewrûpa xwendevanên me hene û li her çar parçeyên Kurdistanê rojname belav dibe. Ji bo daxwazên xwendevanên xwe bi giştî em bînin cih em dixwazin rûpelên rojnameyê zêde bikin. Di salvegera Welat a yekemîn de rojname wê bibe bîst rûpel. Berî vê guhertinê em dixwazin pêşniyarên nivîskar û xwendevanên xwe bipirsin.

tinên we çi ne? Ji me re binivîsin. Wek anketekê biçûk ez dixwazim çend pirsan binivîsim.

-Zimanê Welat çawa ye? Zehmetiyên we ji aliyê zimên ve çi

ne? Divê çawa be?

-Hûn dixwazin di her çar rûpelên nû de em li ser çi bisekinin?

-Li ser naveroka nivîsan dîtinên we çi ne?

-Xeber divê di Welat de çawa cih bigirin? Giraniya xeberan dê çawa be? Kijan xeber bala we dikeşînin?

-Nivîskarên ku hûn dixwazin di Welat de binivîsin hene? Navên wan ji me re binivîsin.

-Kijan rûpelên Welat bala we dikeşînin?

-Ji aliyê teknîk û mîzanpajê ve hûn Welat çawa dibînin?

-Bi taybetî hûn dixwazin em li ser çi babetî bisekinin?

Dîtin û rexneyên xwe ji me re binivîsin.

Dewlet dixwaze rojname û kovarên Kurdan di çarçoveyê de bihêle. Li Kurdistanê şirketên belavkirinê rojnameya me belav nakin. Li Tirkîyê jî gelek astengiyên derdixin. Rojnameyên ku em bi postê dişînin, gelek caran nagihîjin navnîşanê. Em li ber zehmetiyan tu caran venakşin. Di vê demê de divê em rojnameya xwe xurttir bikin.

Ji dêla rojnameyekê 2-3 rojnameyan bikin û bibin abone. Şert çiqasî zehmet jî bin ev roj wê derbas bibin. Divê em alîkariyê bi hev re bikin.

Em li benda nivîsên we ne.

FERHENGOK

- Alim: Argûşk, hinarik, dêm
- Amojgeh: Enstîtu
- Amûr: Alet, enstrûman
- Bawîskandin: (esnemek)
- Belîşin: Tahrikirin
- Beşîşandin: Bişirandin, tebesum kirin
- Bênijandin: Pişkandin (hapşirmak)
- Bêvil: Poz, difin, kep
- Birişt: Bikêr, erdê bi ber(verimli)
- Cerd: (baskun)
- Erdhej: Zelzele
- Felişandin: Pelişandin, feşkilandin
- Hênijandin: (uyuklamak)
- Kamiran: Bextewar, dilşad
- Kesixandin: Suravkkirin (salamura yapmak)
- Kolk: Kox, pîn
- Kone: Xasûk (kurnaz)
- Kuji/i: Koşe, kunc
- Kulandin: (aksamak, topallamak)
- Lewitandin: Edemkirin, herimandin (batırmak)
- Licimandin: (aksamak)
- Mehdik: Dergûş (beşik)
- Mortal: (kalkan)
- Mertel: (elbiselek)
- Nijid: (akın)
- Nijdevan: (akıncı)
- Noli: Mina, weki
- Patîle: (gözleme)
- Pelikandin: Ji hev fikarekirin (çekinme)
- Peqandin: Teqandin
- Pejn: Pejn, hes, deng
- Raye: Selahiyet (yetki)
- Rayedar: Xwedî selahiyet
- Rewnapak: Pakrewan, şehîd
- Rêl: Dehl, daristan
- Sihêti: Ceribandin
- Stewardin: Gihîştin, çêbûn, kemiandin
- Şewîşandin: (sendelemek)
- Tafil: Pêre (hemen)
- Taxûk: (kuzak)
- Teriqin: Ji hev belavbûn
- Teriqandin: Ji hev belavkirin
- Tewq: Qat
- Tewqandin: Qatkirin
- Xirikandin: Bi erdê ve kaşkirin, kişandin
- Zerandin: Kedxwarî (sömürmek)
- Zinat: Zilm, sitemkarî

Nameyek ji Memo Dekşûrî re

Birêz berpirsiyar û rêvebirên rojnameya Welat;

Di hejmara 40'yê di rûpelê 14 an de gotareke li ser navê Memo Dekşûrî hatiye weşandin. Me ev gotar xwend û em pê zehf xemgîn bûn. Nivîsên wiha bi rojnameya Welat nakevin. Em Memo Dekşûrî nas nakin. Jiyana wî di çi rewşê de ye, îdeolojî û ramanên wî çi ne, di bin bandûra kîjan bûyerê de ma ye û jî kê re xizmetê dike? Em nizanin. Lê belê em we -rojnameya Welat- nivîskarên we yê giranbûha û xwediyê rojnameyê, birêz Zübeyir Aydar qenc dinasin. Em bi we serbilind in. Bi vê yekê re jî, di têkoşîna şoreşê û di rizgariya neteweyî de jî we cihekî zehf paqij û birûmet standiye. We berpirsiyariyê mezin li xwe pejirandiye. Em zanin ku we serê xwe di rîya vê têkoşîna de gorî kiriye. Hûn dixwazin gelê dil û bindest bi azîneke zanistî li doza xwe xwedî derkeve, girseyên gel di bingehê şoreşge-

rî de binin ba hev, îdeal û ramanên wan bikin yek û di cokerê de biherikînin.

Di vî warî de em bi têkoşin û şoreşgeriya we ewle ne.

Berpirsiyarên hêja; hûn çawa li Dekşûrî xwedî derketin? Hûn ji ramanên wî yê lewitî (gemarî) re bûn pergala û piştêk û we di vê rojnameya paqij de weşand. Em, xwendevanên we bi vê bûyerê xemgîn bûn. Ew gotar berî her tiştî, ne li avakirinê lê, li xopandinê (hilweşandinê); ne li yekîtiyê û li tevahiyê lê, li cudahiya girseyên gel digere. Xistina nakokî û dijberiya ku dixê nava gel ji xwe re kiriye armanc. Heqaterê mezin bi hijîjk û rewşenbîrên herêmê kiriyê û wan ji şoreşê re kiriye dijber. Çaxa ku gel van nîrxên xwe neparêze an jî ew bi gelê xwe ewle nebin divê ji herêmê veqetin. Cihê wan vala jî bimîne an jî, ji rojava kesên li dijî şoreşê û dijminên me bînin, wê herêm li gelê-me bibe dojeh. Wê çi fêde li gel û şoreşê bibe.

Kenê guran bi vê raman û siyasetê tê. Ev zanyarî çewt e û şaş e.

Dibe ku hûn nizanibin Dekşûrî çi ye? Dekşûrî ji mirovên eşîra Dekşûran in. Herêm wana baş dinase. Li Mîrgeha Mêrdîne eşîreke bi navê Şemikan a mezin heye. Du liqên (şax) vê eşîrê hene. Yek jê Hevêrkan: Serokên wê malbatê Haco ye; tu gazine me ji wan nîn in. A din Dekşûran e. Serokên wê Şêxmûsê Çelebî û Felemezê Cîmo ye. Ev herdu axa xwediyê sê hezar (3000) cerdevan in û li dijî şoreşê tedi-koşin.

Ku Memo vî navê lewitî û gemarî li gor xwe ditibe bila navê wî lê sed pîroz be.

Heta ku navê wî Dekşûrî be ma wê kî pê bawer bibe û beşdarî ramanên wî bibe.

Heger Memo di fikrê û ramanên xwe de durust be, berî her tiştî divê ku di eşîreta xwe de li hember feodalên eşîra xwe tîbikoşe û gelê xwe ji bin zilm

û bandûra Çelebî û Cîmo rizgar bike. Bi vî awayî wê navê wî li herêmê bûbûya lehengekî gelêrî. Wî çaxî wê mafê wî jî hebûya ku rewşenbîrên xwe te-wandar bikira.

Em nikarin ji we re behsa têkoşin û şoreşa neteweyî bikin. Em vî mafî û vê hêzê di xwe de nabînin. Lê belê tişteki eşkere ye ku em hemû dizanin şoreşa neteweyî ne bi cudahî lê, bi yekîtiya hêzên gelêrî pêk tê. Xwendevan, hijîjk û rewşenbîrên li herêmê bi çi awahî be jî ne li dijî şoreşê ne. Belê, di nava şoreşê de ne û xwe wiha dibînin. Li gorî mercên îroyîn rojeveke wan jî heye. Plan û programeke wan heye û tê de tedi-koşin. Bila di vî warî de tu şik û şubhe ji we re çenebin. Em nikarin bi dewla Dekşûrî biçin avê an jî bi werisê wî dakevin binê bîrê. Wê seqetî çêbibe. Mirîna di ber mafên gel û rizgariya neteweyî de cangorî (şehîdî) ye. Cangorî merhale-yeke herî mezin e. Lewre canê xwe gorî dikin. Di standîna mafên gel û rizgariya neteweyî de, ji cangoriyê bêhtir, pêdivî (ihtiyaç) bi pîraniya rewşenbîran, xebatkaran, nivîskaran,

helbestvanan, wênevanan û mîrxasan heye. Pêdivî bi serhildanan heye. Pêdivî bi her livbazi û çalakîyan ku wê têkoşîna bi pêşve bibe heye. Divê ev hêzên gelêrî bi azîneke (metod) zanistî bigihîjin hevûdu û berzîtir di rîya şoreşê de bimeşin.

Li her derê û di her meseleyê de diz hene. Di navbera nîr û bizmar de jî, wê dizîya xwe bikin. Îro li herêmê diz pîrr hindik in. Du sê hijîjkên diz hebin, ev nayê wê maneyê ku hijîjkên me hemû diz in. Di vî warî de ramana Memo çewt e. Em ne di vê fikrê û ramanê de ne.

Xebatkaran Welat, ez dixwazim şaşiyek we rast bikim. Sembola Sifirê ne Ac. an jî Ag. ye.

Ag. sembola zîv e (Argentum). Kurdî: Sifir
Tirkî: Bakir
Latînî: Üprî
Sembola Sifirê ji Cuprî pêkanî-ne Cû ye.


Xeta, di hejmara 39. û 40'yê de ye.

Ji Mîrgeha Mêrdîne, li ser navê rewşenbîr û hijîjkên tîkoşer

I.Omerî

Bûyerên hefteyê

Gerîla bi ser Diyarbekir ve girt



Navenda Nûçeyan- Ji demekî û vir ve êrişên gerîla yê bajêr, li navenda Diyarbekir dom dikin. Ji van êrişan yê herî mezin di 14 Kanûn 1992 an de çêbûn.

Di 14'ê Kanûna 1992 an de, saet li dora 19.00 an gerîlayên bajêr êrişek birin ser hêza çalak (çevik kuvvet) a ku li taxa Bağlar li hêla Nîsanê ye. Ev şer li dora pênc saetan dom kir. Li hember vê êrişê gerîla, bi agirvedana polîsan, li taxa Bağlar li ser kolan (cadde) a Emek û li derdorên nexweşxaneyê şer belav bû. Ev şer li dora saetek dom kir.

Bi qedandina vî şerî ve, ji hawîrdorê Diyarbekir dengê silahan hat. Dû re elektrîkên bajêr hatin birîn.

Saet li dora 21.00 an bi sistbûna şerê li Bağlarê, li derdora dibistana Namîk Kemal bi êrişbirina li ser erebeyên polîsan ên ku dewriyê digerin, şer ji nû ve giran bû.

Di kuçeyên taxa Seyrantepe de jî şerek çêbû. Ev şer jî niv saet domiya. Wekî din grûbek gerîla êrişek bir nîzamiya Kolordiya Heftemîn.

Di van êrişan de, avahiya hêzên çalak, lojmanên polîsan, avahiya DSI û TMO'yê xesar dîtin. Berpirsiyarên dewletê der mafê birîndar û kuştîyan de tu agahdarî nedan. Lê tê gotin ku sivilek hatiye kuştin. Di domana van bûyeran de, waliyê herêmê, waliyê Diyarbekir û midûrê emniyetê bi bêtêlê (têlsizê) emir didan polîsan. Wekî din bi anonasa bêtêlan xwîn dihatê xwestin. Di domana şer de ketin û derketina bajêr hate qedexekirin û li dû rawestandina şer jî, pirr kes hatin binçavkirin.

Li gor nûçeyên Kurd-Ha di van bûyeran de gelek leşker û polîs hatine kuştin. Çavkaniyên gerîla jî hê daxwiyaniyek der mafê van bûyeran de belav nekirine.

Waliyê Herêmê Ünal Erkan, daxwaniyek da rojnamevanan. Di vê daxwiyaniyê de dibêje ku: "Li navenda bajêr, li 4-5 cihan şer çêbûn. Piştî van bûyeran sed kes hatin girtin."

Berê jî êrişên gerîla li navenda Diyarbekir çêdibûn. Lê ev cara yekemîn e ku êrişek bi vî rengî li çardorê navenda Diyarbekir bi saetan

dom kir, çêdibe.

12 Kanûn 1992 -Li Diyarbekir li taxa Şehitlikê gerîlayan erebeyeke polîsan gullebaran kirin. 2 polîs kuştin, 3 jî birîndar kirin.

Li Sirucê xayînek ji alî gerîlayan ve hate kuştin.

13 Kanûn 1992 -Li Nisêbinê li nêzîkî Lîseyê Nisêbinê gerîlayan erebeyeke polîsan gullebaran kirin, 3 polîs birîndar kirin.

Di navbera Mêrdînê û Nisêbinê de, gerîlayan êriş birin ser qereqola Tilkiteyê. Gelek xesar dane qereqolê.

Li Diyarbekir, gerîlayan li taxa Bağlar'a êriş birin ser miduriya "Çevik Kuvvet"ê, lojmanên polîs û avahiyan dewletê. Di nav hêzên dewletê û gerîlayan de şer derket û di demeke kurt de şer belav bû: Li nêzîkî Lîseyê Namîk Kemal erebeyeke polîsan hate gullebarankirin. Li taxa Aziziye, gerîlayan, serleşkeriya Kolorduyê gullebaran kirin. Şer nêzîkî 5 saeta dom kir. Avahiya Çevik Kuvvetê, DSI û TMO gelek xesar dîtin. Di dawiyê şer de hêzên dewletê 100 kes girtin û xistin binçav.

Li Nisêbinê Serokê hizb-î kontra Abdulgafur Dil ji alî gerîlayan ve hate kuştin.

15 Kanûn 1992 -Li Diyarbekir bayiyekî ku rojnameya Özgür Gündem difrot, ji alî hizb-î kontra ve hate kuştin.

16 Kanûn 1992 -Li Batmanê li taxa Koxika, welatparêz Mehmet Yıldız ji alî hizb-î kontra ve hate kuştin. Li taxa Beşevler jî M.Sait Yıldız, ji alî hizb-î kontrayan ve hate kuştin.

Li Nisêbinê jî 2 kes Ali Tuac û

Bedrettin Kılıç ji alî hizb-î kontrayan ve hatin kuştin.

Li Qoserê (Kızıltepe) 2 hizb-î kontrayên ku welatparêzekî taqîp dikirin hatin gullebarankirin. Hizb-î kontrayek hate kuştin, yek jî birîndar bû. Li Lîseyê Qoserê, di nav şagirtên welatparêz û yê hizb-î kontrayan de şer derket, 2 kes birîndar bûn.

Li navçeya Çınarê, gerîlayan êrişî ser gundê Beşpınar kirin. Li gund xayînekî kuştin. Di navbera Diyarbekir û Licê de, gerîlayan rê birîn. Nasnameya qontrol kirin. Propaganda kirin û erebeyeke PTT'ê şewitandin.

17 kanûn 1992 -Gerîlayan êrişî ser navçeya Piranê kirin. Li navçeyê avahiyan dewletê gullebaran kirin û bi roketavêjan avahiyan dewletê kutan.

Di navbera navçeya Çınarê û gundê wê Şêxçoban de gerîlayan li ser pira Piraxanê rê birin. Ji erebeyeke ku gerîlayan xwast bisekine û nesekîni de gule berdan gerîlayan, gerîlayek mir. Gerîlayan jî erebeyê gullebaran kirin. 4 hizbikontra kuştin. Ev her çar kes serokê hizbî kontrayan bûn. Gerîlayan bi şûn ve jî, ji erebeyekê 3 cerdevan derxistin û wan bi xwe re birin. Ji vê bûyerê bi şûnve hêzên dewletê êrişî ser gundê Şêxçoban kirin. Bi gundiyan îşkence kirin û xaniyên 4 gundiyan şewitandin.

Di navbera Diyarbekir û Licê de li nêzîkî gundê Fisê gerîlayan rê birin, nasnameyan qontrol kirin û erebeyeke PTT'ê şewitandin.

Li Diyarbekirê li taxa Şehitlikê û li Nisêbinê jî li taxa Kişla'yê 2 kes ji alî hizbikontrayan ve hatin kuştin.

Bayiyekî rojnameyan hate kuştin

Bayiyê rojnameyan Kemal Ekinci li Diyarbekir bi êrişeke kontrayan hate kuştin. Kemal Ekinci, berê jî gelek caran, ji bo rojnameya Özgür Gündem'ê, Ülke, Welat, Azadî, Gerçek û 2000'e Doğru nefroşe hatibû tehdîtkirin.

Kemal Ekinci, li Diyarbekir li Cadeya İnönü bayîffî dikir. Roja 15'ê Kanûnê saet li derdora 8.00 an, li ser rîya karê xwe hate gullebarankirin. Kemal Ekinci li cihê bûyerê mir.

HAWAR

Dilbixwîn

Ji welatê xwe hez dikim!

Ez nikarim; Nikarim ji bîr bikim, ezê çawa ji bîr bikim wê giyana (ruh) ku pê jiyan dibim! Nikarim ji dil cuda bikim û bi hawara wê re xwe nelivînim.

Belê, ez ji welatê xwe hez dikim!

Ne tenê ji zindiyên, ne tenê ji tazî, şat û birçiyên, ne tenê ji pêxwas, belengaz û sêwiyan, lê ez ji gor, goristan û miriyên xwe jî hez dikim.

Bila bişewitînin dar û berên welatê min, bila sirgûn bikin şalûl û bilbilên li ser şaxan, bila bombe bikin çiyân.. Gelo, dikarin çi bi dest xwe ve bînin? Wê çi qezenc bikin? Ezê dîsa hez bikim ji bilbil, dar û ber, çiya û zozanên welatê xwe. Bila bizanibin wê bilbilên azadiyê berdewam bikin strana Meşa Azadiyê.

Fîrdews e (cînet e, bihuşt e) welatê min! Ger bîkin dogeh jî (ci-hennem) ezê dî-

sa jê hez bikim. Fantom, Atom, dinya tev bibe yek jî nikarin biçilmisînin gula li ser dilê min.

Ezê hilqetînim stûyê kundan, ew kundên li ser kavilan dixwînin. Sirgûn bikim wan, bila biçin bi ser koz û kozikên dijminan de lorîkan bixwî-

nin, welatê min ne şîngeh e, egîdistan e, lehengîstan e, şêristan e...

Werin!

Ez bi dar û bêran, bi keviran, bi xençeran, bi meş û serhildanan, bi dilan, bi cegeran, bi das û çakûçan, bi pênuş û rîşikan, bi def, dahol û zirneyan, bi tembûr, bilûr û neyan, bi sirûd, marş û stranên, ez bi her sê alan... Hûn jî, bi tançan, bi topan, bi bombe û balefiran...

Werin em meydana mêraniyê dixwînin.

Ji welatê xwe hez dikim!

Ji heyva wê, ji stêrkên wê, ji zivistan, buhar, payîz û havîna wê hez dikim. Text û tacên dinyayê tev bidin min jî, dîsa ezê xwe di dora Cûdî, Herekol, Agirî û Şengalê re bigerinim. Ezê serdangeha (mezargeh) xwe Lalişê bi kesk û sor û zer bixemilînim. Ger mirineke min hebe wê ji bo serxwebûnê be, ger jiyaneke min hebe jî wê kêlî bi kêlî ji bo azadiyê be. Bi vî çavî ez li mirin û jiyana xwe dimeyîzînim.


Ez namirim, min dil nîn e bimirim. Lê eger rojekê em ji hev qetiyên, ji bîr mekin wê dilê min li teniştê dilê we be, ezê bi emanetî li nik we bihêlim..

Ji welatê xwe hez dikim!

Lewre eger hozan bim ez hozanê welatê xwe me. Eger şervan bim jî, ez dîsa şervanê welatê xwe me. Ne tenê ji welatê xwe, ji mirovahiyê jî hez dikim, lê mixabin mirovahî ketiye devê topan. Bûye nêçîra sîstema cihanê ya nû, kûr-kûr dinale, çare çi ye? Hîna welatê min serbixwê nebûye...

Almanya dîroka xwe ya tarî nû dike

Nûçeyên Derve- Ev ji demekê ve ye, li Almanya bûyerên balkêş û girîng diqewimin. Biyanîyên ku li Almanya niştêcih bûne, bi êrişên nazîyan tene kuştin û birîndarkirin. Zarok û jin di malên xwe de tene şewitandin. Dewleta Alman ji bi awayekî veşari nazîyan xurt dike û destekê dide wan. Almanya di warê demokrasîyê de, polîtîkayêke du alî dimeşîne. Li hember raya dinyayê, nazîyan protesto dikin, lê, di bin de, bi her awayî nazîyan destek dikin. Xurtbûna nazîyên Alman, bi destê dewleta Almanî bi xwe ye.



Serokwezîrê Almanya, Helmut Kohl

matên leşkerî hene. Îro li Kurdistanê gel, bi çekên Almanî tene kuştin. Cendekên xortên Kurd, li dû tanqên Alman tene kişandin. Niha jî, ji bo qirkirineke girseyî, çekên Alman ên teknolojîk ji Tirkîye re tene birêkirin. Almanya, li hember Kurdên di nav xwe de jî, polîtîkayek e gemarî dimeşîne. Delegeyên ku ji alî gel ve, di hilbijartina Meclîsa Neteweyî de hatine hilbijartin, ji alî dewleta Alman ve tene tehditkirin. Almanya dixwaze rê li ber hil-

bijartina mebûsan bigire. Ji hemû delegeyan re, an bi nameyan, an jî rû bi rû, tehditan bi rê dike, daku nekevin hilbijartina mebûsiyê.

Jiyana penaberên li Almanya roj bi roj diwartir dibe. Almanya bi qanûnên nû û nedemokratîk rê li ber penaberîyê digire. Ji niha û pê ve, tu kes zû bi zû, bi çî hincetî dibe bila bibe ji bo penaberîyê nikare bikeve Almanya. Wisa xuya dibe ku ev êrişên nazîyan yên ku di van demên dawî de pêk hatin, ji bo amadekariyên vî qanûne bûn.



Almanya: Dewleta polîsî

Gavan Koçer

Di demekê berê de nivîskare rojnâmeya Welat Yekda Welat der barê xurtbûna nazîzmê ya li Almanya sekinîbû û bi kurtî sedemên wê kolanîdibû. Ji ber ku ev mijar xwedî lêkolandinê ye, me jî dibe ku di vî warê de xwedî çend xalên giranbûla be nixrîndina rojnâmeya Klassekampen a der barê biryara dewletê de bi kurtî ji bo xwendevanên xwe wergerand.

Wek ku tê xuyakirin aligirên Ko-

ma Ewropayê, biryara Almanya wek taybetiyekî wê ya demokratîk dibînin. Yanê li gor wan ev biryar nişana demokrasiya Almanya ya bingehîn dide.

Wek em dizanin der barê mafên Filîstîniyan de jî gelek biryar ji aliyê Neteweyên Yekbûyî (NY) ve hatîye standin. Lê di karvaniyê de ew tu caran nayên bikaranîn.

Ev jî 20 salan zêdetir in çepên Almanî dibêjin dewleta Almanya ya Rojava di nav dewletên Ewropayê de bi teknolojîya bi dateyê kontrol-

kirî ye, herî mezin e. Di vê domanê de Almanya ya Rojhilatê hê bi kaxiz û telefonan karê xwe dikir. Dibe ku îro li ser dinyayê di destê istixbarat û etaba krîmînalêya Almanî de sistema (ku bi dateyê tê kontrolkirin) a herî pêşveçûyî hebe.

Rêvebirên polîsî, niha dixwazin ji bo karên hundirîn "istixbarateke xas", ku li gor modêla FBI ya Amerîkayê dixebite, bê damezirandin". Ew li ba xwe bi tenê ne li ser nazîyan herwiha li ser rewşa "çepên ekstremîst" û kes û rêxistinên biyanîyan jî disekinîn. (Neue Arbeiterpress 8'ê Mijdarê).

Demâ neo-nazîyan li Almanya ya Rojava xwe bi rêk û pêk dikirin û hêzên xwe li dar dixistin, dewleta Almanya, ji bo jî holêrakirina partiya Kurdan PKK'ê mijûl bûbû. Lokalên partiye hatine tarûmarkirin û serokên wan hatin girtin û mehke-mekirin ku bi salan dom dikir. Gelo sedemê wê balkişandinê çî bû? Divê ji wan sedeman yek ew be, ku PKK bi materyalên konkret ji hemû rêxistinên Ewropayê zêdetir hevxbatkariya leşkeriya Almanya ya bi dewleta Tirk a faşîst (ku berendamê NATO û hevxbatkar û NY û Yekbûyîna- Rojava (vestunion) e) re ye, derxist holê. Ku dewleta faşîst bi alîkariya wan, şerê li dijî Kurdan û rêxistinên karkeran dajot.

Ew nazîyê Almanî ku Vietnamî Ngyen Van Tu kuştibû, di 8'ê Cotmehê de li dadgeha Berlînê 4-5 sal ceza girt. Ev jî li gori ku gelek lêkolînên sosyolojîkî jî didin diyarkirinê, organên dewletê wek polîs, istixbarat û dadê bi pirranî, ji alî kesên ku nêzî mirovê SSê Schonhubergê bûn, ve tîr birêvebirinê. Ku wî jî partiyan CDU û SPD yê gelekî deng biribûn.

Mirov bi hêsanî dikare bibêje ku pergala dewleta Almanî bi vî qanûnê nû derfeta qedexekirin û xirakirina rêxistinên biyanîyan, ku li Almanya kar dikin, xist destê xwe. Wek PKK, TKP rêxistinên Tamilan û Filîstîniyan û hwd. de di salên nêzik de para xwe ji pergala "antifaşîstî" ya dewleta Alman bigirin.

Belê, qedexekirina nazîyan, rîya dewleta polîsî ye.

GOTIN

Yaşar Kaya



Partiya Keda Gel (HEP)

Dinya me ev çend sal in bi lez diguhere. Bayê azadî û demokrasîyê li her derî xurt tê. Şoreşên ked û sosyalîstî li paş man, roj a mafên mirovan û demokrasîyê ye. Dinya bi wê de diçe. Di nav 70 salî de, partiyan ku li Tirkîyê hatine avakirin hemû bendewar û xulamên îdeolojiya dewletê ne, yanî giş bendewarên kemalîzmê ne.

Kurdan bala xwe dayê ku dinya bi riyeke teze ve dimeşe. Pêwîst bû em jî li gor wê rîya nû tiştê bikin. Bi vê daxwazê Kurd li Stenbolê civiyan, komeleyek çêkirin û navê wê danîn "Yeni Oluşum Komitesi".

Paşê, ji wê komîteyê çend heval çûne Enqerê û bi wan mebûsên ku ji SHP'ê hatibûn avêtin re xeber dan. Me wê şevê gotin û rêça xwe kire yek. Divê bû me partiyeke nû çêbikira, ev jî bo me Kurdan pîrr girîng bû, ji sedan salan ve, hê fersendeyêke wiha ketibû destê me.

Di demeke kin de, Partiya Keda Gel

(HEP) hate avakirin û di nav gel de bi rêxistin bû. Li Kurdistanê, li bajarên mezin teşkilat hatin avakirinê. Paşî li Diyarbakir şehîdê me yê mezin Wedat Aydın hate kuştin. Em ji bo rakirina cenazeyê wî çûn Diyarbakir. Serhildaneke bi şan û şeref li dar ket. Çiya û banî ji bo Vedat bi me re diqêriyan. Kontr-gerîla bi tîmên xwe ve, ji helikopteran gulle barandin ser me. Me 15 şehîd dan. Bi sedan-dusedan birîndarên me hebûn. Bêhna xwîne ji kuçeyên Diyarbakira delal dihat. Mebûsên me, serokê partiye giş birîndar bûn. Min eskerî kiribû, lê

Lê, îro em dinêrin, dewlet çav lê ye ku HEP'ê bigire. Ev ne çare ye. Hewce ye HEP bijî. Ew hevalên ku HEP'ê damezirandin, hinek jî wan ne zana bûn, hevalên ku ne di nav HEP'ê de bûn nehiştin HEP bi serê xwe û bi dengê xwe mezin bibe.

belê min şerekî wiha nedîtibû. Gelê me li zarokên xwe xwedî derdiketin, her kesî di malên xwe de jin û mêran vedîştin.

Sibehê zû, em yên ku li pê mabûn rabûn. Me jî êvarê ve sond xwaribû ku emê herin partiye vekin û li wir rûnên,

bila bên me li wir bikujin.

Em ji meydana ku Şêx Seîdê nemir lê bi darvekiribûn derbas bûn, çûn partiye. Min dîna xwe dayê ku kuçeyên Diyarbakir gelê me hilnade. Serê gişan bilind bû. Çavên wan diçirîsî, mirin nedihate bîra wan. Dewletê nihêrî em gaweke bi paş ve navêjin. Dawî, ji me re astengeke nû derxistin û partiya me nexistin hilbijartinê.

Me gelek rojên bi zehmetî derbas kir, dikirin ku serên me jê bikin, lê me serê xwe neda jêkirin. Bi dek û dolaban nikaribûn me li derve bihêlin. Bi SHPê re îtifaka me çêbû û em wilo çûne hilbijartinê. Ez di wan rojan de çûme welat, 8 rojan li Wanê mam, paşî di ser Bedlîsê re derbasî Diyarbakir bûm. Li Kurdistanê gul û beybûn vebûbûn. Gelê me li zarokên xwe bûbû xwedî. Me jî 20'î zêdetir mebûs derxistin. Ev di dîroka Kurdistanê de demeke nû bû.

Partiya Keda Gel di nav gelê me de şax û kok daye, ew dengê me ye, ew kela me ya demokrasîyê ye, ew lingê gelê me yê meclîsê ne, ji bo me jiyan e, ew kela biratiya gelê Kurd û Tirk e. Heta ji ser cendekên me derbas nebin, kes nikare wê kelehê bi dest xwe bixe.

Lê, îro em dinêrin, dewlet çav lê ye ku HEP'ê bigire. Ev ne çare ye. Hewce ye HEP bijî. Ew hevalên ku HEP'ê damezirandin, hinek jî wan ne zana bûn, hevalên ku ne di nav HEP'ê de bûn nehiştin HEP bi serê xwe û bi dengê xwe mezin bibe.



Tirkiye di rojeva Rêxistina Efû de ye

Berpirsiyarê Tirkiyê yê Rêxistina Navneteweyî ya Efûyê Ronald Berghusy, da xuyan ku li Tirkiyê her diçe mafên mirovan tê ihlalkirin û ji ber van sebeban jî Tirkiyê jî rojeva wan nakeve.

Berpirsiyarê Tirkiyê yê Rêxistina Efûyê sebebê ku tim û tim Tirkiyê dixin rojeva xwe wiha dinirxîne: "Li hember hemû îkazên me hê jî rojnâmevan tene kuştin. Li gor peymanên navneteweyî dema bin çav de mayîne 48 saet e, di gel we yekê bi awayekî kêfî ev dem tê zêdekirin û xistina binçav jî didome. Li şûna kêmbûna ihlalkirina mafên mirovahî her diçe ihlalkirin zêde dibin."

Berghusy li ser bûyerên Şîrnex, Stenbol, Enqere û li deverên din jî rawestiya. Got ku li ku çî biqewime tafîlî ew li cihê bûyerê lêkolînên xwe dikin û bûyerê bi navgînên ragihandîne pêşkêşî raya giştî dikin. Berghusy, Dewletên Yekbûyî yên Amerika, Almanya, Swîsre (Îsvîçre) û hin dewletên Ewropa jî hemû ihlalkirina mafên mirovan berpirsiyar girt, her wiha jî bo bûyerên Tirkiyê jî wan berpirsiyar girt.


Li ser pîrsa ku 48 mebusên Swîsrê xwestibûn di navbera PKK û Tirkiyê de navberiyê bikin lê Tirkiyê bi vî yekê têkildar nebûbû jî wiha axift: "Jixwe me tiştêk jî ve hikûmeta ku dixwaze ihlalkirina mafên mirovan bidomîne, helwesteke aşîxwaz hevî nedikir. Ango em li hember helwesta Tirkiyê neheyrîn, şaş neman."

Berghusy bi berdewamî li ser girtina Partiya Keda Gel (HEP), gullebarankirina meşvanan, pest û pêkutîya li ser çapemeniya pêşverû û şerşer mîna Özgür Gündem, Yeni Ülke, 2000'e Doğru û hwd. rawestiya û got: "... ev yek didin nişan ku hikûmet dixwaze gelşan çawa hel bike."

Li ser pîrsa ku hikûmet jî hevdişîna bi PKK'ê re direve, dê divê PKK siyaseteke çawa bidomîne jî, nêrinên xwe wiha diyar kir: "Ez baş têdîgihem ku çima PKK diviyatî bi çekê dibîne. Lê Rêxistina Navneteweyî bi prensîbî li hember tevgerên çekdar e. Lewre yên ku di dawiyê de zirare dibînin mirov in. Dibe ku PKK mafdar be. Lê em ne li dijî PKK'ê ne, li hemberî azînen (metodên) wê ne."

Berpirsiyarê Tirkiyê yê Rêxistina Navneteweyî Ronald Berghusy, gotinên xwe wiha qedand "Em hem li Tirkiyê û hem jî li 'Rojhilatê-Başûr' (Kurdistan) xwedî têkiliyên baş in. Em ihlalkirina mafên mirovan tafîlê hin dibin."

Türk-İş qalîk guhert



Serokê Türk-İş'ê yê kevin Şevket Yılmaz

Navenda Nûçeyan- Türk-İş konfederasyonê karkeran e ku jî 32 sendikayan pêk hatiye. Di nav rejîma Tirkiyê de, cihêkê wê yê girîng heye. Bi nêzikayîya xwe ya bi dewletê re tê nasîn û wek nûnerê sendikayên zer (sexte) tê binavkirin.

Türk-İş, jî roja damezirandina xwe û heta niha bi armanca domandina rejîma sermayedaran xebitiye. Ji devê serokê wê yê kevin Şevket Yılmaz "weke pîrek bûye di nav sermayedar û karkeran de". Lê ev pîr, tim û tim jî bo berjewendiyên sermayedaran hatiye bikaranîn.

Serokê Türk-İş'ê yê kevin Şevket Yılmaz, 10 sal berê bi daxwaz û desteka cûntaya faşîst bûbû serokê vî konfederasyonê. Şevket Yılmaz û ev konfederasyona paşverû, jî bo rêlibergirtina tevgerên karkeran bûbûn navgînek di destê cûntaya 12 İlonê de. Türk-İş vî peywîr (wezîfe)-a xwe heta îro jî bi serfirazî domand. Karkeran bi destê rejîmê birçî hiştin û kirin ku jî bilî daxwazên aborî, di tu warî de xwe nedin pêş. Karker jî rastiya xwe ya çînî (sınıfsal) dîr ketin, aboriya wan bû derdê wan ê yekemîn. Siyasetê li xwe qedexe kirin. Di pêvajoya 10 salan de, hemû mafên wan ên çînî, civakî û aborî jî wan hate standin. Wilo bû ku

tu deng jî wan dernediket, lewre ew di xebata nanozîko de fêtisibûn û darê zorê tim li ser serê wan mîna şûrê Demokles dihejiya.

Heftiya çûyî kongreya Türk-İş'ê pêk hat û Şevket Yılmaz tevî hevalên xwe seltaneta 10 salan wînda kir û bi girîn cihê xwe da Bayram Meral.

ÇI GUHERÎ?

32 sendikayên ku beşdarî kongreyê bûn, 23 hebê wî li hember Şevket Yılmaz derketin û rayên xwe dan Serokê Yol-İş'ê Bayram Meral. 7 sendika bi Şevket Yılmaz re bûn, Kristal-İş xwe vekîşand û Hava-İş jî, li hember herdu berendamî derket û got: "Herdu jî bînamûs in, ferqa yekî jî yê din tune ye."

Di kongreyê de, faşîstan Şevket Yılmaz destek kirin, Bayram Meral jî, desteka Sosyal Demokratîtan girtibû. Jixwe ew jî bi sosyal demokratiya xwe di hate nasîn.

Weke ku xuya dibe, di rastiye de tu tişt neguherî. Navek çû û yê din kete şûna wî.

Ji rejîmê re, ferqa navan tune ye. Ew li dû kesî jî nagere. Ji bo wan tiştê girîng tevgerên çînî ne û jixwe Türk-İş wek sazîyekê, li hember tevgerên wiha hatiye avakirin.

Panzer jî li ber xwe nadin

Navenda Nûçeyan- Navgînên dewleta Tirk li hember şerê bi gerîla re li ber xwe nadin. Di şerê bi gerîlayên PKK'ê re bi kêr nayên. Dewleta Tirk wan navgînan, bi milyara jî dewletên împeryalist ên Rojava jî bo têkbirina rapêrîna gelê Kurd dikire.

Dewleta Tirk jî bo karibe li hemberî gerîlayên PKK'ê bi hêsani û bî zaiyat têbikoşe dest bi kirîna çekan û navgînên zirxdar kirîye. Her wiha ihaleyê navgînên zirxdar ên personel di nava Miduriyeta Giştî ya Emniyetê û firmaya

Amerîkanî Cadillac Gage de hatibû çêkirin. Ji bo 120 panzerî bi 40 milyon dolarî (340 milyarê pere Tirk) li hev kiribûn. Her hebek bi 229 hezar dolarî ye.

Ev firma jî bo cara pêşîn, 20 hebî şandibû û dewleta Tirk ev panzeran rê kiribû bakurê Kurdistanê. Ji bo bikaranîna li dijî gerîlayan.

Ev panzer hem di bûyerên Şîrnexê de hatibûn bikaranîn û hem jî li deverên din. Panzer di bûyerên Şîrnexê de jî ber gulleyên keleşkofan ên şervanên ARGK'ê

bûbûn mîna Seradê û li navçeya Hênê ku girêdayî bajarê Amedê ye, di şerê bi şervanên ARGK'ê re du polis di hundirê panzerê de jî aliyê gerîlayan ve hatibûn kuştin.

Çapemeniya Tirk, kirîna van panzeran û nezeximbûna wan mîna rezaleteke mezin nixand û heta polis û tim naxwazin bi van panzerên ku jî firmaya Amerîkanî Cadillac Gage hatiye kirin, herin

livbaziyan.

Ev 20 panzer jî hêla "Waliyê Herêmê" ve niha jî karvaniyê hatine kişandin û parçîkirin. Dewleta Tirk hê jî, jî bo têkbirina têkoşîna rizgariya neteweyî hewl dide xwe û artêşa xwe bi van çek û panzeran xurt dibe. Lê ev şer hem jî alî maddî û hem jî, jî alî manevî ve barekî giran dide ser piştê dewleta Tirk û jî her alî ve jî dikeve tengasiyê mezin.

Büyük rezalet!

PKK'ya karşı alınan zırhlı personel araçları daha ilk çatışmalarda kevgire döndü

Emniyet Genel Müdürlüğü'nün Amerika'nın Cadillac Gage firmasından 120 tane alınan 90 milyon dolarlık (340 milyar liralık) zırhlı personel araçları, PKK'ya karşı alınan ilk çatışmalarda kevgire döndü.

Hari'le meydana gelen çatışmada, bu araçların kalın zırhları, PKK'nın ilk çatışma cephelerinde, büyük bir başarıyla parçalandı. Polisler bu araçları almak istemiyorlar. Çoğunlukla 20 arca parça çöktü.

Çatışmaları izleyen Fehi Özlük "Duruma bilyorum. Gelen ilk araçlar tam olarak zırhlı değilmiş, ama fiyatları 300 milyon dolar." dedi.

Bölge Valisi de, araçların kevgire döndüğünü söyledi.

Deliner zırh!

Türkiye'nin emniyet kuvvetleri, PKK'ya karşı alınan zırhlı personel araçları, ilk çatışmalarda kevgire döndü.

Emniyet Genel Müdürlüğü'nün Amerika'nın Cadillac Gage firmasından 120 tane alınan 90 milyon dolarlık (340 milyar liralık) zırhlı personel araçları, PKK'ya karşı alınan ilk çatışmalarda kevgire döndü.

"Rezaleta mezin" Rojnameya Sabah ev bûyer bi vî manşetê bi nav kir.

Li Endonezya zelzele

Li Endonezya li eyaleta Nusa Tenggara ya Rojhilat zelzeleyeke mezin çêbû. Hejmara miriyan gihiştîye 2 hezarî. Rayedarê eyaletê heta niha 1895 terman jî binê xaniyên hilweşiyayî derxistine.

Ev erdhejî di 12 Kanûna 1992 an de hatibû holê. Gerûya erdhejê, Girava Flores e. Li gorî pîvana Richter tundiya erdhejê 6.8 e. Lê li gorî rayedarên eyaleta Kalîforniya ya Amerika ev tundi 7.5 e. Rayedarên Nusa Tenggara ya Rojhilat jî zêdebûna miriyan tirsibûna xwe, di daxuyaniyên xwe de dihanî ziman.

Endonezya welateke li başûrê-rojavaya Asyayê dikeve. Ev welat jî 13.670 giravan (ada) pêk tê. Lê li 12.700 giravan kes najî. Endonezya welatekî xizan e. Li gorî hejmarên 1984 an, dahatû li gorî kesên 486 dolarê Amerika ye. Şênîyên wê, jî sedî nofên wî musulman in. Ên din jî Hîndû, Bûdîst û hwd. in. Debara gelê Endonezya li ser çandiniyê ye.

Gundek û eşîrek li bakurê Kurdistanê


Bozanê Kejî

Gelek mirovên xwe rewşenbîr dihesibînin, dibêjin dewleta Osmanî û Komara Tirkîyê ne mêtînger bû. Ew dibêjin dewleta Osmanî û Komara Tirkîyê nikaribûn Kurdistan bimêta. Wan herdu dewletan, Kurdistan wilo mêtine, pûç kirine.

Gelê Kurd di bin mêtînghe-kariya Osmanî de ji bo jiyana xwe gelek cih li xwe guhertiye. Walî, cendirme û artêşa dewleta Osmanî bi zilm û zordestî, bi qamçor (wergî, bac) û talanan, bi kuştin û nefikirinan, gelê Kurdistanê perîşan kiriye. Osmanî eşîrên Kurd pêşi bi begîtî weke Îdrîsî Bedlîsî xapandine, bi xwe ve girê daye. Paşî eşîrên Kurd perçiqandine, talan kirine, nefî kirine. Tu mêze dikî ku nivê eşîrê li Şamê ye, nivê din li Serhedê ye, an jî nivê eşîrê li Suleymaniyê ye, nivê din jî li Enqerê ye. Ji ber mêtînghekarîya Ali Osmanî, geşbûyîna aborî û civakiya gelê Kurd ne bi serê xwe bûye, bi kel-kotî geş bûye.

Ez di vê nivîsarê de li bakurê Kurdistanê, gundekî û jî vî gundî jî nava sê sed-çar sed (300-400) salê dawî de pirr gund di bin mêtînghekarîya Osmanî û Tirkîyê de çawa belav bûne şîrove dikim. Armanca min di bin kolonyalîzm û kapîtalîzma dewleta Osmanî û Komara Tirkîyê de gelê Kurd çawa xizan, perîşan bûye, bi nimûneyek diyar bikim. Armanca min ne li pê sekinandina eşîrtiyê ye, me divê eşîr û eşîrtî zû verîşe, ji hev bikeve.

Navê gund Kejan, e eşîrê jî Kejî ye. Gundê Kejan (Kamışlık) li wilayeta Elezîze (Mazra), bîst (20) kilometre rojevayî qeza Sivricê ye, gundê Kejan li ser newalekê saz bûye û li ser sê taxa ye. Hawîrdora gund, newal û daristan e. Di daristanê de pirranî darên mazî ne, lê belê darên hirmî û bihîvan jî hene. Başûrê gund çiya ye, zozan e, ji bo pez xwedîkirinê pirr spehî ye. Erdê çandiniyê kêm e, yê ku hene lê genim, ceh, nok, bostan û zerzewat tene çandin. Bingeha debra xelkê gundê Kejanê, ji berê ve li ser pez xwedîkirinê ye. Dema berê dewlemendên xwedî pênc sed an hezar (500-1000) pez hebûne. Hirî, qatix, berx û kavire wan li cem taciran pirr bi nav û deng bû. Lê belê tamma cendirme, tahsîldar û artêşa Osmanî tune bû. Walî ji wan xugî û bertîl (rişwet) divêt. Artêşa Osmanî leşker divêt. Lê



Gundek li bakurê Kurdistanê

tu xêra dewletê ji gund û xelkê gund re tune bû.

Bêyî vê zilm û zordestiya dewletê, pêvajoyeke dirêj, li Kejanê û li hawîrdora wê xela çêbûye. Buxukek heye navê wê sinik e (1). Li bakurê Kurdistanê, ji vê buxukê re qimil an jî rexêk tê gotin. Mam Musa Anter navê pirtûkeke xwe Qimil daniye. Dema serê havînê sinik jî deştê dikişin zozanan çayan. Reşên sinik, wexta ku dikişin li ser rîya xwe, li genim û cehê hîna hişin vedinin û hebikan dimijin. Bi mijandina sinik, çandiniya genim û ceh li dar pûç dibe, tê derava neçinînê. Ji aliyekî din ve pêregirtinê nexweşiyên pez çêdibin. Gava ku nexweşî (zerik, tebek, vîjik, heb, spî, kijnik, qimî hwd.) dikeve nava pez hemû diqelînin, qir dibin. Sala ku her du pêregirtin bi ser gel de tê, hingê dibê xela. Dewleta Osmanî, ji nexweşiyên pez û çandiniyê re tu çare nedidît. Ta pêncî şêst (50-60) salên dawî, ne dewleta Osmanî û ne jî Komara Tirkîyê ji xelê re tu havil nekiriye.

Bi gotinên pêşiyar, di demeke kevn de gelê gund ji bo namûsa xwe li ber mufrezeyê cendirmeyên Osmanî rabûne, dest hilanîne û tevî zabîte wan deh cendirme kuştine. Şeva ku kuştine, sibetirê bi şefeqê ve koç kirine. Koçê wan bi başûr ve, berroyî ve (berî) çûne.

Dewleta Osmanî fermana wan derxistiye. Koçê wan jî Swêrekê bi şûn ve bûne du alî.

Aliyê yekemîn li rojevayê Qerejdaxê hêwirîne, li daw û deşta rojava li çiyê cih girtine. Vê gavê li pênc gundan rûniştine. Navê wan gundan: Şexûliyajerîn, Şexûliya jorîn, Kamışlî, Awûrtepe, Qantir û Otilî. Ew li wan gundan rûniştine, lê belê zivistanê pezê xwe birine beriyê (2). Havînê jî li ser Qerejdaxê diçêrandin. Hinek mal hîna jî bi vî awahî debara xwe derbas dikin. Têcirê Diyarbekir û Ruhayê mişteriyê hirî, qatix, berx û kavirê wan bûn. Birincê (riz) Qerejdaxê nivê pirr wan diçand. Anêka dewletê av ji wan standiyê. Eşîrên hawîrdora wan, ji wan re dibêjin, "Keja". (3) Dema ku Siltan Evdîlhemîd Alayê Hemîdî saz kiriye, hêzek jî, ji eşîra Kejî saz bûye. Di pêvajoyê de du hekim profesor (4), endezyar, parêzker, endamê Yargitayê û hwd. gelek xwenda jê derketine. Lê belê mirov dikare bibêje ku tu kara wan ne gihîştîye gelê wan.

Dem a ku Tirkîyê li Serêkaniyê çiftlika dewletê saz kiriye (1950) şivanê pez hemû ji Kejayê Qerejdaxê girtine. Pêşiyê jî Trakyayê şivan anîne, ew jî heq nehatine der û reviyane. Paşî şivaniya pezê çiftlikê ji Kejan re maye. Nêzikî sed malî li Serêkaniyê rûdinin. Lê belê ni-

ha ji bo şixulandina çiftlikê, ji bo şivaniya wê torpîl divê. Li erdê bav û kalê xwe bûne biyanî. Lê li ber serê wan dewleta Tirkîyê, ji Afganîyan re apartman lêkiriye, gom lêkiriye, av daye, elektrîk daye, ji bo çandiniyê erd daye, traktor daye, qredî daye û ji şixulandinê re jî pêşani daye.

Aliyê duyemîn li deşta Bezikî (navbera Suruç û Bozowayê) hewirîne. Navê hinek gundên wan: Xanhewşer, Sizan Ordêg, Gerdeg, Budakli, Uzunburç, Birgenî, Dûderî, Zivanli, Damlica, Egrice û Ikiz. Evan jî li doraliyê xwe Alakejî tîn zanin, lê pêwendiyên eşîrtiyê ji nava wan rabûye. Niha pez jî xwedî dikin, lê bingeha debara wan vejeriyayê ser darê fistiqan. Gelek mal jê ketine bajarê Ruhayê. Gelek xwendî, parêzker, bijîjk, mamoste, endezyar jê derketine.

Niha, hinek dewlemendên Kejan, pezên xwe zivistanê dibin Siwêrekê. Hinek jî, li nêzikî Elezîzê erd standinê, gom çêkirine û pezên xwe li wê derê xwedî dikin. Gelek mal ketine nava Elezîzê. Ji hêla pez xwedîkirinê, ji aliyê qetix ve û ji aliyê mêraniyê ve li Elezîzê bi nav û deng in. Ji bilî vê yekê, di nava sih-çil (30-40) salê dawî de, qasî sed û pêncî-du sed (150-200) mal ji ber kapîtalîzmê xizan bûne, feqîr

bûne û çûne Stenbolê.

Diyar dibe ku ji gundê Kejan, di nav sê sed-çar sed (300-400) salên dawî de, gelê gund ji ber mêtînghekarî û ji ber kapîtalîzmê li gelek cih belav bûye: Stenbol, Elezîz, Siwêrek, Diyarbekir, Ruha, Serêkaniyê û çûne Elmanyayê jî. Ev mirov ji aliyê bavê ve, deh panzdeh (10-15) bav bi şûn ve digihîjin hevûdu. Lê belê, niha tev hevûdu nas nakin. Bi hevûdu re bûne biyanî, bûne xerîb.

Ev nimûne diyar dike ku, dewleta Osmanî ji gelê Kurd û Kurdistanê re mêtînghekar bû. Di bin kolonyalîzma Osmanî de gelê Kurdistanê wilo çeliqiyê, pring pringî bûye. Tu dinêrî nivê eşîrê li başûrê Kurdistanê ye, nivê li bakur e, an jî nivî li rojevayê welat e, nivê din li rojhilatê welat e.

Çavkanî:

- (1) Sinik (Eurygaster integriceps Put) Bi Tirkî Süne.
- (2) Berfî: Deşta Ruha û Mêrdînê, Berya Mêrdînê, Berya Kîkî.
- (3) Ziya Gökalp di pirtûka xwe ya li ser eşîrê Kurd nivîsandiye, navê Keja di nava eşîra Milan de qebileyek nîşan dide.
- (4) Prof. Dr. Şükran Karacadağ, dekanê kevin (Hacettepe Tıp. Fak.) Prof. Dr. Orhan Karacadağ Rektörê kevin.



Zor gizêrê radike.

Gofinek pêşiyên Kurdan

PIRS Û BERSIVEKE DÎROKÎ



Pirs:
Leşkerên
Amerîkî
xelkê
Viyetnamê
çawa
dikuştin?

Bersiv:
Leşkerên
Amerîkî wexta
Viyetnamiyan
dikuştin, ji ber ku
zanibin ji Bakur in an
jî, ji Başûr in.
Li pusulayê dinêrtin.
(Cavanna)



**Pirsa
rojane:**
Leşkerên Amerîkî
gelo wê Somaliyan bi
kîjan metodan bikujin?

Firavîn û şîv

Di serhildana Sasonê de zilamek ji mala Perîxanê jî dikeve nav berxwedanê. Pirraniya malbata wan jî hevalbendê dagirkera ye. Her wekî tê zanîn bi alîkariya hin xayîn û kirêgirtiya ve hêzên Kurdan ên çêdar şikestin û belav bûn. Ev zilamê ha jî dixwaze bizîvire gund û xwe li ba mirovên xwe biparêze. Hêzên xwînwar jî li hemû devera rav û nêçira mirovan dikan. Ferqa ter û hişk nakin. Kî ber wan dikeve kom dikan. Bi wî awahî çûna gundên hevalbendên xwe ji bîr nakin. Dema tene gundê wan, zilam xwe di kolkê mirîşkan de vedîşere. Birayê wî dixwaze rutba xwe ya xiyaretê bilind bike. Ji ber wê çendê, wî welatparêzî jî cihê ku xwe lê veşartiyê derdixê û teslîmî hovan dîke. Hemberê wê bênamûsî û bêrûmetiyê rexne û gazinda birayê xwe dîke û wê gotinê dibêje: "Te ez kirim firavîn, lê baş bizane ku demekî kurt de tu jî dê bibî şîv." Rastî jî belavbûna bûyera gotina wî ew rast derdixê. Kedxwar di demekî nêzik de hevalbendê

xwe yê birakuj jî, dikujin. Hemû serhildanên Kurdan bi wan xiyaneta ve tijîne. Dijmînan li dijî her Musayekî Kurd firewnekî li hember derxistinê. Lê piştî tenirandina berxwedanê hema li paş kuştina Musayan, firewnên Kurd, ji rûreşî û şermizari ew holê rakirine.

Mixabin niha jî li Kurdis-

tanê hinek serokên Kurd ketine vê xeletiya dîrokî. Ger îro dewlet gerîlayên ARGK'ê jî holê rake, bi gotineke din şervanê azadiya Kurdistanê jî xwe re bike firavîn, wê sibe jî wan serokên xayîn û tevî hevalbendên wan jî xwe re bike şîv. Dîrok vê rastiyê nişan dide.

Behzad Berçelani

Abdurrahman Durre

Dengê Kurdistanê
(Dîwan I)

EVÎNA WELAT

Weşanên Melsa

Dengê Kurdistanê

Dîwan I

EVÎNA WELAT

A. DURRE



Navnîşana Xwestinê:

Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 3/8
Cağaloğlu / İstanbul Tel: 512 29 17

TÎR

Musa Anter



Büyük Millet Meclisi?

Navê Meclîsa me Büyük Millet Meclîsî ye. Yanî Meclîsa Miletê mezin. Ê ma lawo Tirkno, meclîsa miletan ya biçûk heye? Ku ya we mezin e, ma gelo meclîsên dinyayê mirov bi wezinîne û bipîve ji ya me biçûktir û siviktir heye? Kamara Lordan a Îngilîz û Kamara Avam a Îngilîz, Senatoya Amerîka, Meclîsa Fransa biçûk in, lê ya me mezin e. Ne hewce ye, heta niha heqareta ku li meclîsa me bûye û hîn jî biçûktir heta tunetir kirine. Lê ew meclîsên dewletên xelkê yê ne mezin ji miletê wan hemû re bimbarek e, ne medenî û ne esker wek tirba Ş.E. Qadir kes destê xwe nikare bidîye û jê re îhtiramê dikan.

Pirsa min li ser îro ye. Berê gelek kerş û merş, ne însantî di vê meclîsa me ya mezin de bihurtîne. Em hema zanin. Ma wê kî kê bixapîne. Erê em nikarin qenc meclîsê binivîsinin ya sax e. Lê gerek xwendevanên me ji van pirsên min fêhm bikin. Çêlîkekî Tirkeş li Enqere pêde bûye. Navê wî Nusret Demiral e û di ser kulan re Sawciyê Dewlet Güvenlik Mahkemesi ye. Mêrik rastûrê xwe daye dijminahiya Kurdan. Gerçî ew jî ne di tu halî de ye, her kêlî demançê di eniya xwe de dibîne. Carekê ez çûm mehkemeya wî, li Enqere di hundirê mehkemê de 9-10 polîs li ber bûn ku kes wî nekuje. Nalet li heyata wîlo be. De îca binêrin bê ev verişandina wî ya talî û pîs çî ye? 22 du mebûsên me yê Kurd hene û ez jî tevî wan kirime. Mêrik îdama me dixwaze. Me çî kiriye hûn zanin? Di wextê hilbijartinê de, me xeber daye bi Kurmancî û me ji miletê xwe yê Kurd re gotiye lawo êdî bes e raya xwe nedin bênamûsan û dijminên miletê xwe. Ev xebardana me bi Nusret efendî nexweş hatiye û wan jî xwe re xistiye qanûnê cezayê, nimra wê 125 e, temamê şehîdên Kurdistanê Şêx Seîd û dora xwe, S.Riza û dora xwe û şehîdên me yên din yên nenas jî bi vê madda weşî hatin îdamkirin. Lê hîn kela mêrik sar nebûye. Çavên wî lê ye, me jî bigihîne bav û kalên me. Weleh yê min ez gelekî dixwazim ku bi ya Nusret bibe, min jî têxe şerefa Ş.Seîd û S.Riza. Lê destê min li zarokên min, xortên mebûs nagere. Erê ez zanim ku Nusret û yên jê re dibin qewet nikarin tu guylî belav bikin, lê hema cardin nexweş e.

Qezeteyên îro, yên Tirkan 23'ê Gulanê dinivîsin ku Nusret ji meclîsê 22 heb mebûsên Kurd dixwaze ku wan îdam bike. Serokreisê haşa meclîsa me ya mezin Hocaoğlu ev xwesteka Nusret qebûl kiriye û daye meclîsê. Lê ez qenc fêhm dikim ku ev îş bi devê Cindoruk û Silêmana Demirel e. Li gora hesabê wan Hocaoğlu ji partiya Anavatanê ye, em Kurd dê ji Anavatanê nefret bikin raya bi Silmêna din. Kuro nalet li dê û bavê wî Kurdî bê ku raya xwe bi Silman û partiya wî de. Niha Anavatan ehmeq e, tiştina dike bi nezani, lê partiya Silêman Demirel bi dijminayî û pîçî dike. Ma lawo Silêman, Kurd ehmeqê te û bavê te ne? Nalet li wî Kurdî be ku cardin bê xapandin û li dor te bibin kom, bes e lo.

Lawo Kurdino ez tîm 80 salî, wilehî ez ji mirina xwe natirsim lê ez ji bênamûsiya yekî Kurd tenê ji mirinê aciz dibim. Ma bavên min, çirna hûn çavên xwe venakin, lawo heywan jî dijminên xwe nas dikan, ma hûn wek heywanan jî nayên, malxerabno!

Bêdengiya berî bahozê

Navenda Nûçeyan- Welatê Kurdan, îro ji nû ve dibe şahidê qirkirin û qetlaman. Dewlet, bi biryara tunekirina serhildana Kurd, dixwaze ji nû ve qirikirinek wek ya Şêx Seîd, Seyîd Riza, Geliyê Zilan û yê din li dar bixe. Serokwezîrê Tirkîyê Süleyman Demirel, di civîna bi mebûsên HEP'ê re de, vê bernameyê eşkere kir û wiha got: "Heta niha 28 serhildanên Kurd li dar ketine. Dewlet wan serhildanan çawa têk biribe, dê vê jî têk bibe".

Şerê taybetî yê ku heta niha li Kurdistanê dihat meşandin, niha bûye şerekî bi giştî û hemû Kurdan daye ber xwe. Tevahiya Kurdan, jin, zarok, kal, xort hemû hedefên vî şerî ne. Valakirin û talankirina gundan, koçberkirin, kuştin, binçavkirinê girseyî tev parçeyek ji vê bernameya

şerê giştî ne.

BINÇAVKIRINÊN GIRSEYÎ

Tenê di sala 1992 an de, hejmarê Kurdên ku hatine binçavkirin û ji îşkencexaneyên dewletê derbasbûne 11.500 e. Carna gundekî bi giştî, tevî zar û zêcan tene girtin û bi rojan di qereqolên dewletê de dimînin. Girtîgehên sîvil hemû ji van girtiyên siyasî re hatine veqetandin.

Di van rojên dawî de, hejmarê mirovên binçavkirî zêde bûye. Êdî li ku derê bûyerek çêbibe, xelkên ku li nêzî bûyerê dijîn tev de tene girtin. Gelek caran ji van girtiyan çend kes, ji alî hêzên dewletê ve tene kuştin û ev kesên sîvil, di nûçeyên televîzyon û rojnameyan de, dibin "terorîst" û tene teşhîrkirin. Tenê li Diyarbekir, li ser van bû-



Gel tevî mebûsên Partiya Keda Gel (HEP) li ser goristanekê. Ev kes li gundekî Mêrdînê ji hêla kontr-gerîla ve hatibûn qetilkirin.

yerên dawî ku gerîlayên ARGK'ê bi ser çend avahiyên dewletê ve girtibûn, bi sedan

kes hatin girtin û ji îşkenceyê derbas bûn.

VALAKIRINA GUNDAN

Dewleta Tirk, riya tunekirina serhildana Kurd, di valakirin û talankirina gundan de dibîne. Li gor dîtina wan, ger gund û mezrayên Kurdistanê bêne valakirin, dê gerîla desteka xwe ya lojîstîk wînda bike û belav bibe. Ji bo pêkanîna vê jî, li hember gundiyan Kurd, bi desteka cerdevanan êrişên hov dimeşînin û gundan vala dikin. Ji destpêka şerê çekdarî ya ji 1984 an vir ve, bi hezaran gund hatina valakirin û gundiyan Kurd berê xwe dane bajarên mezin, metropolên Tirk û koçber bûne.

Bi îlankirina şerê giştî re, koçberkirina gundiyan Kurd çend qat bûye. Ber bi zivistanê

ve, êrişên hêzên dewletê, yê bi ser gundan de zêde bûn. Cerdevan, tîm û leşker, di talankirina gundan Kurdistanê de, mil bi mil li ser kar in. Weke li dû nêçîrê bigerin, li dû Kurdan digerin û dikujin.

LI METROPOLÊN TIRK ÊRÎŞÊN KONTRAYAN

Kurdên ku li metropolên Tirk bi cih bûne jî, ji bo dewletê hedef in. Dewlet li bajarên xwe jî dixwaze bernameya tunekirina Kurdan bimeşîne. Heta niha nêzîkî 10 welatparêz ji alî "hêzên tarî" ve hatine kuştin. Li Antalya 2 endamên HEP'ê, qurbanên vî şerê gemar ên dawî bûn. Li Stenbolê jî xwestin çend rêvebirên HEP'ê bi vî rengî bikujin. Lê ew kesên êrişkar hatin deşîfîrkirin û rê li ber êrişêke wiha hate girtin.

STRATEJIYA PKK'Ê

Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK), li hember vî şerê giştî bernameya xwe wiha diyar kir:

1-Bicîhbûna li pişt cepheya dijmin.

2-Ji bo parastina girsên gel, xurtkirina mekanîzmayên leşkerî.

3-Temamkirina xebatên Meclîsa Neteweyî.

Çavkaniyên PKK'ê, êrişa ku li Antalya li erebeya polîsan hate kirin, bi vê bernameyê ve girêdan û beyankirin ku, dê êrişên bi vî rengî bidomin.

GELÊ KURD DI SÎNORÊ TEQÎNÊ DE YE

Îro li Kurdistanê, bêdengiyek heye. Lê ji vê bêdengiyê, bêhna bahozêke xurt tê. Gel ji sînorê tehemulê bihuriye. Dewlet jî her diçe zilma xwe dijiwartir dike.

Wisa xuya ye ku di van rojan de, dê bahozêke bi hêz rabe û gelek tiştan bidê ber xwe.

Wezîrê Karên Dervehî yê Hollanda P.H. Kooijman:

'Li her derê dinyayê li dijî îşkenceyê me'

Hans Van den Broek ku ev 10 sal e Wezîrê Karên Dervehî yê Hollanda ye îstîfakir. Van den Broek bi politikayên û têkiliyên xwe yê baş ku bi Amerîka re tê de bû dihat nasîn û di platformên navneteweyî de jî gelek caran piştgirîya dewleta Tirkîyê dikir.

Li şûna wî Şêwirmendê Weqfa Kurd-Hollanda Profesora Hîqûqa Kamû, P.H.Kooijman bû wezîrê karên dervehî.

P.H.Kooijman di nava salên 1973-1977 an de alîkarê wezîrê karên

dervehî bû. Di 1982-1985 an de ji delegasyona Hollanda di nav Komîsyona Mafên Mirovan yê Neteweyên Yekbûyî de cih girt. Di komîsyona NYê de raporê taybetî yê îşkenceyê bû. Di 1991'ê de raporek li ser îhlalkirina mafên mirovan yê ku li Îngîltere, Îtalya û Îspanya dibin de hazir kir. Kooijman wê demê di axaftineke xwe de digot ku "Kî li kura dinyayê dibe bila bibe, heke pest û îşkenceyê dîtibe ezê her dem li ba wan bim."

Serhildana 29'an

Siyasetvanên Tirkîyê, hêzên leşkerî, çapemenî, saziyên dewletê, zanîngehên wan giştî, di govenda şerê giştî (Topyekûn Savaş) û qirkirineke nû de ne. Li ber dengê daholên şer, govenda tunekirina serhildana Kurd digirin. Asîman bi ewrên reş dagirtine. Bêhna brûsk û bahozên bi hêz, li herêmê tansiyonê bilind dike. Herkes li benda teqînê ye. Dê ew ewrên reş barên xwe vala bikin. Û dê bahozê bi hêz û xurt gelek tiştan bide ber xwe.

Dewlet, ji bo qirkirinê hemû amadekariyên xwe temam kiriye. Bi şerê psîkolojîk, çavê gelê xwe kor kiriye. Nijadperestî îro rastiya Tirkîyê ye. Mejiyên nezanan, bi propagandayên Bosna-Hersekê şolî bûye. Kes ni-

zane li wê çî diqewime, lê bala wan li wê ye. Niha jî, leşkerên Somalîyê. Dê zarokên xizanan biçin û ji-bo menfaetên Amerîka bimirin. Lê propagandayên yek alî, nahêlin gel rastiye bibîne. Perdeyê reş û qalind dikişînin ber çavên wan û çî bixwazin wî nîşanî wan didin.

Serokwezîrê Tirkîyê, qala qirkirina 29'an dike. Di civînê de, ji mebûsên HEP'ê re dibêje: "Me 28 serhildanan çawa şikandibe, emê vê jî wilo bişikênin." Ev beyaneke vekirî ye û politikayên Tirkîyê eşkere dike.

Gelê Kurd û hêza wî ya çekdar jî, bi zanîna van politikayên dewletê yê hov, bi taktîk û stratejiyên nû têkoşîna xwe her diçî bi hêztir û xurtir didomînin. PKK bernameya xwe ya li gor şertên

niha beyan kir. Li gor vê beyanê, dê ji niha pê ve, li metropolên Tirkîyê livbaziyan girîng çêbibin û şer bê berfirekkirin, ji bo girsên gel, li hember êrişên dagirkeran bêne parastin, dê mekanîzmayên leşkerî bêne xurtkirin û Meclîsa Neteweyî bê îlankirin.

Xuya ye ku gelê Kurd ne bêçare ye. Dema şikandina serhildanên Kurd bihuriye. Darê zorê fêde nake, qirkirin fêde nakin. Gelê Kurd şoreşa xwe diji û di wê zanîna de ye ku, ev bê xwîn nabe.

Dê bahozê rabe û dê gelek tişt bide ber xwe û bibe. Lê dê ew ne şoreşa gelê Kurd be. Di dawîya bahozan de, roj dizên û bi tîrêjên xwe yê germ û ron, mizgîniya jiyaneke nû û rohnî didin.

Rapora heyeta Îngîlîz

Rûken Baxdû

Di 3 û 8'ê Cotmeha 1992 an de, Serokê Koma Mafên Mirova ji parlamentoya Îngîltere mebûs Lord Avebury û Nûnerê Dêra Katolîkan û Serokê Ofisa Penaberan (multecî) Michael Feeney hatin bakurê Kurdistanê (Kurdistan-Tirkiyê) û di dawiyê ve serdanê de li ser lêkolîn û dîtînen xwe raporek amade kirin. Rapor bi navê "Wêrankirin û Sûstîmal-kirin" ê (Desolated and Profaned) hazir bûye û 18 rûpel e.

Di destpêka raporê de bi kurtahî li ser armanca serdana heyetê tê sekinandin. Lord Avebury û heyeta pê re sebebên ve serdanê bi zêdebûna gilî û gazinên Kurdên ku li Tirkiyê dijîn û ji pest û îşkenceya ku li wan tê kirin ve girê didin. Bi taybetî jî, ji Newroza 1992 an û bi vir ve terora dewletê ku li dijî sivîlan û li gund û navçeyên Kurdistanê tê meşandin, bala ve heyetê û hinek saziyên demokratîk dikişîne ser pîrsa Kurdan.

Ev lêkolîn di raporê de bi van sernavan pêşkêş dibe: "Raborîna Kurdistanê ya Polîtîk û Dîrokî", "Wêrankirina Şîrnexê", "Êrîş û pesta ku li ser gund û navçeyên din dibe", "Êrîşên li ser rojnamevan û nivîskarên ku li ser rewşa Kurdistanê dinivîsin, dibe", "Polîtîkaya dewleta Tirk ya hundirîn û muxalefeta Kurd" û "Pêşniyarên heyetê ji bo çareser-kirina pîrsa Kurd". Rapor di bin van sernavan de hazir bûye.

RABORÎNA KURDISTANÊ YA POLÎTİK Û DÎROKÎ

Di beşa raborîna Kurdistanê ya polîtîk û dîrokî de bi kurtahî ji dema Osmaniyan û heta îro li ser rewşa Kurdan hatiye sekinandin. Di vir de tê diyarkirin ku gotina

"Kurd û Kurdistan" di dema Osmaniyan de hebûye û hatiye bi kar anîn.

Kurd di bin otorîteya Osmaniyan de her çiqas nebe jî bi şiklekî wek otonomî îdareya xwe kirine. Di peymanê Sevîrê de (1920) -ku qebûl bûbûna- wê Kurd serbixwe li parçeyekî Kurdistanê bi jiyana. Lê belê 1923 yan de piştî ku peymanê Lozanê hat îmzekirin ev maf bi tu awayî jî aliyê Komara Tirkiyê ya nû ve nehat qebûl kirin. Ji wê rojê û pê ve jî ev 70 sal e ku di nav Kurdan de her carê bi awayekî serhildan û tevgerên bi alî azadiyê ve çêbûne. Li hember vî jî li Tirkiyê di 1960, 1971 û di 1980 yan de sê caran derbeyên leşkerî çêbûn. Di vî navê de tevgera Kurd ya herî radikîl PKK di 1978 an de damezîrî. Kurd êdî bi awayekî sistematîk dest bi têkoşîna çekdarî kirin, li hember hêzên leşkerî yê dewleta

Tirk. Bi pêşveçûna têkoşîna re dewleta Tirk di qanûna xwe ya bingehîn de hin guherînan çêkir. Wek maddeyên 141. û 142. Lê belê li şûna van îca qanûna Antî-terorê derxistin ku di nav vî qanûnê û yê din de jî alî nave-rokê ve tu ferq nîn e. Ji ber vî jî şerê di nav PKK'ê û dewleta Tirk de roj bi roj geştir dibe...

Dîtînen heyetê di vî beşê de wiha didome û diçe. Li ser wêrankirina Şîrnexê jî rapor bala raya giştî dikişîne ser daxuyaniyên dewletê û dîtînen gelê Şîrnexê. Wezîrê Karên Hundirîn İsmet Sezgin di daxuyaniyên xwe de dibêje ku: "Gerîla êrîşî Şîrnexê kir û hêzên dewletê jî bi wan re şer kirin." Lê xelkên Şîrnexê dibêjin ku dewlet seranser bi top û tanqan êrîşî ser me û malên me kirin.

Di vî bûyera Şîrnexê de 28 kesên sivil miribûn.

Wekî din di vî raporê de ev salek e, rojnamevanên ku der heqê rewşa Kurdistanê de nivîsin e û hatine kuştin cih digirin. Ev rojnamevan û nivîskarên ku ji rojnameya Özgür Gündem, Yeni Ülke, kovara Özgür Halk û 2000'e Doğru ne ev in: Hafız Akdemir (27), Vahap Aslan, Abdullah Arsoy, İrfan Uçar, Faruk Sakık, Burhan Karadeniz (19), Bahattin Özen, Yahya Orhan (28), Celal Pekgöl (24), Hüseyin Deniz û Musa Anter (74).

DÎTIN Û PÊŞNIYARÎ

Rapor bi dîtînen û pêşniyarên ve heyetê ya der heqê çareserkirina pîrsa Kurd de diqede. Dîtînen û pêşniyarên xwe wiha tînin zimên: "Di encama ve serdanê de bi kurtahî be jî, em der heqê jiyana Kurdan ya îroyîn de bûn xwedî hinek fikr û dîtînen. Bi kêmasî be jî em dîroka wan ya polîtîk û statu-



Desolated and profaned

A report by Lord Avebury, Chairman of the Parliamentary Human Rights Commission and Sir Michael Feeney, Member of the Commons House of Lords, on their mission to the Kurds in Turkey, 3 to 8 September 1992

Berga rapora heyeta Îngîlîz

ya wan a îro hîn bûn. Li temamê dinyayê rêxistinên ku ji bo serxwebûnê têdikoşin, li hember dewletên serdest herdem leqayî terorê bûne. Wek Eritre, Tîbet, Keşmîr û hwd. Weke ku Amerîka kete Vîyetnamê û di dawiyê de mecbûr ma derket. Her wekî din Rûs jî di dawiyê de dev ji îşgala Afganîstanê berdan. Ev pîrsgirêk bi xwînê çareser nabin. Pêşniyariya me ew e ku di bin çavdêriya hêzên navneteweyî de, di nav dewleta Tirk û nûnerên Kurdan de referandûmek li dar keve. Lê ev nayê wê maneyê ku em bibêjin bila dewleta Tirk ji sînorên Mîsak-i Millî feragat bike. Em tabîra ku dewleta Tirk ji PKK'ê re dibêje "terorîst" red dikin. Em dixwazin herdu alî jî li gor qadêyên şer, şer bikin. Her çiqas PKK tim êrîşî ser hêzên dewletê yê leşkerî û cerdevanan bike jî, dewleta Tirk bê hedef berê xwe dide herêmên ku sivîlên Kurd lê dijîn û wan dide ber bombeyan. Ev tişt ku dewleta Tirk dike ji xeynî terorê tiştêkî din nîn e. Bi bûyera Şîrnexê jî ev rastî derket holê.


Ji aliyê din ve pesta (baskî) sistematîk ya ku li ser nasnameya Kurdî tê meşandin, didome. Me di bûyera Newrozê de jî, ji Komara Tirk ji bo bûyerê tahkîkat xwestibû lê ev daxwaza me neanîn cih.

Ji ber van hemû tiştan em ji Civata Ewropa û hikûmeta Îngîltere dixwazin ku heyetek di bin çavdêriya hêzên navneteweyî de here Kurdistanê û îhlalkirina mafên mirovan di cih de tesbît bike.

Divê şerê li wê herêmê li gorî Peymana Cenevreyê were meşandin. Û em hilanîna ambargoya sîlahan ya Almanya jî protesto dikin. Tevî vî jî divê di bin çavdêriya Neteweyên Yekbûyî de ambargoya sîlahan bê danîn û ev ambargoya heya ku diyalogêke siyasî di nav dewleta Tirk û nûnerên Kurdan de çênebe, ranebe.

Em dixwazin Kurd jî mîna dewletên Efrîqa, Rohilata Ewropa û Komarên Sovyeta kevin li qada Neteweyên Yekbûyî bînin temsîl kirin.

Û em gazî hemû sazî û komeleyên mafên mirovan yê navneteweyî dikin ku alîkariya Kurdan bikin û jî ve zordestîya ku li wan dibe re bédeng nemînin."



Ji heyeta Îngîlîz Lord Avebury û Michael Feeney li gundê 'Dağcılar' li ser êrîşên dewletê bi gundiyan re diaxivîn.

Xabur hate girtin xizani serî rakir

Di navbera Cizîrê û Xaxo de bêhna xelayê alav dide, kesên ku rewşa wan jî xweş e herêmê dişemirînin, diterikînin. Berê xwe didin Stenbolê, İzmirê, Edenê, Mêrsînê, Dilûkê (Entebê) û hwd. Ev bajarên ku li ser rîya Hevrîşim an rîya Baharat an jî bi navê xwe yê nû E-24'ê ne gurmîna dahola birçîbûnê jî wan radibe.

Bi milyonan kes risqê xwe jî vî rîyê derdixistin. Esnaf, karker, tamîrvan, hotelvan, dikandar, danûstandinên dovîzê, qamyonan, şirketên ne-

qilyatan û hwd. hemû risqên xwe û yê malîyên xwe jî vî rîyê derdixistin. Lê ev rîyê niha miriye. Tu erebe tê de naçin nayên. Dergehê Xaburê ku rojê bi hezaran erebe tê de derbas dibûn niha xemgîn e, bê mirûz û made ye. Stûxwar e.

Her tişt bi Şerê Xelîcê dest pê kir. Ambargoya Neteweyên Yekbûyî, ev rîyê mirand. Dû re ambargoyên PKK'ê jî bo tîkiliyên di navbera wan û hêzên Başûr. Lê ev rabûn, bi demêke kurt domiyan. Lê niha Tirkiyê

nahêle erebe derbasî Başûr bibin. Gelên herêmê ku debara wan li ser vî rîyê bûn perîşan in, gelek kes îflas kirine; hîn jî li ber îflasbûnê ne. Başûr jî rewşa, wê xweş nîn e. Rêxistinên Navneteweyî birçîbûna nav Başûr û Iraqê dihênin zimên. Lê kes li ser rewşa talukeya xelayê ya li nav Cizîrê, Silopî, Hezex, Nisêbîn, Qoser û Ruhayê nasekine.

Gelê herêmê, jî vî aliyê ard, rûn, şeker, kartol û hwd. bi qamyonan dibirin wî alî, jî wir jî mazotê dihanin. Da-

nûstandineke wiha di nav wan de hebû. Bi vî rengî debara xwe dikirin. Lê niha her tişt rawestiya ye. Tirkiyê nahêle ev rewş bidome. Lewre jî Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal bigirin heta hemû karmend û rayedarên dewletê bi yek devêkî digotin, "dahatuya mazotê jî PKK'ê re diçe."

Tepe repa piyê xizaniyê hêdî hêdî bilind dibe. Li herêmê, ne tenê xizani û birçîbûn heye her wiha herêm vala dibe. Herkes bi cihêkî ve koçmal dibe.

PÊNÛS



Amed Tigrîs

Bi zimanên biyanî nenivîsin

Em Kurd her dem ji pêşî û mezinên xwe, bi taybetî ji ronakbîrên Kurd ên berî xwe lome, gazin û rexneyan dikin ku wan bi Kurdî nenivîsandine. Bi Kurdî berhem li pey xwe nehiştine. Ji ber vê yekê jî, ziman û edebiyata me, bi pêş neketiye. Heta winda bûye. Ji me re heta îro mîrasekê nehiştine ku em li ser deynin û jê fêde bibînin. Wê dewlemend bikin. Ew Kurdên ku heta niha bi zimanên Farisî, Erebfî, Osmanî û Tirkî nivîsandine, bi Kurdî binivîsandina, niha hejmara berhemên Kurdî bi hezaran bihatina dîtin. Rewş û sewiya ziman û edebiyata me jî wiha jar û perîşan nedima.

Baş e, em niha di vî warî de çi dikin? Niha ji gelek ronakbîrên me, hem li welat û hem jî li derê welat berhemên xwe bi Kurdî nanivîsin, pirranî bi Tirkî dinivîsin.

Dema mirov ji wan dipirse:

-Gelo çima tu bi Tirkî dinivîsî?

Ew çend sedeman şan didin:

-Pirtûk û nivîsarên bi Kurdî zêde nayêne xwendin. Mirov zêde pere qezenc nake. Ez nikarim dîtinên xwe baş bi Kurdî formule bikim. Termînolojîya zimanê Kurdî tune an jî kême. Ji bo min ferqa Kurdî û

Pêwist e ku ronakbîr û nivîskarên Kurd berpirsiyar û erkên xwe bizanibin. Rola xwe ya dîrokî bilizin. Hinek sergêjî, asteng û probleman wek sedemên bingehîn nîşan nedin û ji xwe re destekan çênekin. Problem û zehmetî çiqas mezin û giran dibin bila bibin, divê mirov xwe bide ber vî barê giran. Bi Kurdî axaftin, fikirandin û nivîsandin ji xwe re bikin prensîba bingehîn û yekemîn.

Tirkî tune ye...û hwd.

Baş e, ger em bi Kurdî nenivîsin, xwendevanên Kurd dê çawa zêde bibin? Ger em jî bi Kurdî nenivîsin û wernegerînin dê termînolojîya Kurdî ji ber xwe ve çawa çê û zêde bibe? Çawa ferqa zimanê Kurdî û Tirkî tune? Ma wê çaxê ew çi lome, gazin û rexneyên me ne ku em li ronakbîrên dema berî xwe dikin? Ji derê wê jî ev çi kefteleft e ku em di nav de ne? Ev çi têkoşîn û berxwedana sed salan e?

Bi rastî, divê mirov girîngiya dema xwe û nivîsîna bi Kurdî bizanibe. Pêwist e ku ronakbîr û nivîskarên Kurd berpirsiyar û erkên xwe bizanibin. Rola xwe ya dîrokî bilizin. Hinek sergêjî, asteng û probleman wek sedemên bingehîn nîşan nedin û ji xwe re destekan çênekin. Problem û zehmetî çiqas mezin û giran dibin bila bibin, divê mirov xwe bide ber vî barê giran. Bi Kurdî axaftin, fikirandin û nivîsandin ji xwe re bikin prensîba bingehîn û yekemîn.

Divê şaş neyê fêmkirin, ez ne li dijî nivîsandina bi Tirkî û zimanên din ên biyanî me. Lê divê berî her kesî û her tiştî mirov bi zimanê xwe binivîse û bixwîne. Û ku zimanê mirov qedexe be jî! Rêxistin ji bo propaganda, ajîstasyon û rexistinê dikarin bi zimanê xwe û bi zimanên biyanî binivîsin. Lê, rêxistinên Kurd jî, divê ji bir nekin ku barê giran li ser milên wan e. Ew jî divê berê bi zimanê gelê xwe binivîsin û paşê bi zimanên biyanî.

Lê, şexs ji bo çi bi zimanên biyanî dinivîsin? Gelo ji bo belavkirina bir û baweriyên xwe an jî, ji bo propagandaya navê xwê? Helbet ev gotinên min ji bo ew Kurdên ku dikarin bi Kurdî û Tirkî, Erebfî an jî Farisî binivîsin re ye.

Pêşiyên me tişteki safî nekin û hemû barên xwe yê giran ên sed salan dewrî me kirin. Piştî û qudûm li me şikandin. Qet nebe em vî barê giran piçek be jî, sivik bikin û paşê dewrî zarokên xwe bikin ku ew nifiran li me nekin.

Vekolanên li ser dengnasî û peyvsaziya dîrokî ya zimanê Kurdî û zaravayên wî

2- PROF. PIERRE LECOQ WERGÊR: MAMO CÛMÎ

Miletê "Kurdoî" Strabon geh li Persîde, gel li Etropetênê bi cih dike. Kurdoî, miletekî koçer bû, navî wî tim bi navê miletê "Merdoî" re derdiket; Merdoî eşkere navekî Îranî ye: "meriv" (nêzikkirina navê Manyên û Merdoî guman li ser heye).

Bi kurtî, nivîskarên kevin pîr navên mîletan nîşan dane ku kême-zêde nêzîkî yê Kurdan e. Piraniya caran mîlet koçer in, li cihê ku Kurd îro lê rûdinin, diman. Bi min, bi carekê em nikarin van navên ku me rave kirine bigihîne hev; lê dibe em bikarin ji xwe re pê bilizin û bi hev xinin. Nivîskarên Grêkan miletên mezin ên navçeyê (herêmê) nas dikirin, pîr kême e ku xwe şaş bikin, geh bibêjin "Kerdukh", geh "Kerdeks", geh "Gordyeyan", geh "Keldyên", hwd. Tenê navê Kurdoî diyar e ji navê Kurdan ve nêzîk e, ew jî hin xalên xwe yê zimannasî hene, emê paşê li ser bivîndin.

Berî wê, divê em li ser navê Kurdan ku hîn ji wê kevintir, di dema Sasaniyan de, derdikeve bisekinin. Ew di deqê Pehlewî, Karnamêgî Erdeşîrî Pabegan (Pirtûka Şerên Erdeşîr, lawê Pabeg) de derdikeve. Kesekî bala xwe nedayê (Minorsky bi kurtî di ser re çûye).

Erdeşîr, avakerê mîrîtiya Sasani, piştî ku zora Erdevan, paşayê Erseşîdan, dibe, şerê paşayê Kurdan dike:

1) Piştî wê, leşkerekî mezin (Spah û gund) tîne hev û diçe şerê Madîg, paşayê Kurdan, ê Med (an: Paşayê Med ê Kurdan) (O karêzarî Kurdan şah Madîg freneft)

2) Pîr şer dikin, xwîn pîr dirije û leşkerê Erdeşîr direve.

3) Erdeşîr li ser leşkerê xwe pîr bi xem dibe (an (Nöldeke) ji leşkerên xwe vediqete)

4) Bi şev, digihîje destekê, ne av lê heye, ne jî xwarin. Ew û siwarên xwe tev ti û birçî dibin.

5) Ji dûr ve, şivanekî dibîne; Erdeşîr diçe cem, dibîne ku kalek e, li quntara girekî (ped deştî kof), li ber pez e.

6) Erdeşîr şevê li wir derbas dike, bi sipêdê re, rêkê jê dipirse.


7) Ji wî re dibêjin: "Bi sê fersengan wê de, qezak (Rostag) bi gelek gundan (Abadan) li wir heye, gelek mirov lê hene, pîr zengîn e."

8) Erdeşîr çûye gundekî (dêh) ji wan; mirovek şand ji bo ku ji siwarên xwe bixwaze (an: wî xwest) here şahnişînê.

9) Leşkerê Medan (an Medîg: Spahî Madîgan) jê haydar bûn: "Hêdî, nema em ji Erdeşîr ditirsîn ji ber ku zora wî hate birrîn, çûye Parsê."

10) Erdeşîr, leşkerekî ji 10000 mirov anî hev, berê xwe da wan, da ku bi şev êriş bike.

11) Erdeşîr hezar Kurd kuşt, ên mayîn birîndar bûn û hatine girtin;



Prof. Pierre Lecoq

paşayê Kurdan şande Parsê, tevî lawên wî, birayên wî, zarokên wî, malê wî û gelek tiştên wî.

Kesek nikare nebêje ku ew ne Kurd in. Helbet, em nizanin ka zimanê wan zimanê Kurdan ê îro ye, an na. Lê, li dema Sasaniyan, zimanên mezin çêbûn. Gelê ku şerê Erdeşîr dike û paşayek serokê wan be, gerek e xurt be, di warê siyasî de baş bi rêk û pêk be. Vêca, pîr zor e ku li dema Sasaniya û piştî wan ev gelê di warê miletî û zimannasî de kûr guherî be.

Lê, gerek e em ji gotina "Madîg" haydar bin. Hinekê wî navê kesekî dibînin. Herwisa, gotina "Med" dibe bibe navê kesekî. "Med" û "Mêdî" = Medistan li wê demê çî bû? Navê "Mêdî" (m' d) di belgê Şahpîr de li Ke'beh-a Zerdeşt derdikeve; ji xaka Mêdiya kevin re tê gotin, lê bê guman wateyeke xwe yê zimannasî û miletî ya tevîhevî fireh heye. Emê şaş bibin eger, li gor vê belgê, em bawer bikin ku Med atiyên (bapîrên) Kurdan in. Helbet, Kurd, an piraniya wan, wê çaxê jî, li xaka Mêdiya kevin bûn.

Gotina "Kurd" di parçeyê i-ê yê Karnamêgê de jî derdikeve:

6) Sasan şivanekî Pabeg bû, tim bi dewarên biçûk re dima. Neviyê Dariyûs bû, kurrê Dariyûs bû.

7) Li dema hikmê zordarê Alêksander, (neviyên Dariyûs) reviyabûn û xwe veşartibûn. (Sasan) tevî şivanên Kurd (Ebag Kurdan şubanan) diçû.

Di wergerandina xwe ya Karnamêgê de, Nöldeke gotina "Kurd" wiha werdigerîne: "Şivanên Kurd" (Senjene û Ferehveşî jî wisa dibînin). H.S. Nyberg ev wergerandinê nepejirandiye, gotinê rast dike û dike "Kurtîkan" (di hin destnivîsan de wisa ye; di hin destnivîsên dinê de "Kurdan" an "Kurdîyan" e) û wiha werdigerîne: Azep an koleyên ku gelek cureyên karan di dewletekê de dikin?

Nyberg, bê guman şaş e gava naxwaze bibîne ku ew navê vî miletî ye. Wateya gotina Kurd di parçeyê 5 an de tu guman li ser nîn e. Nyberg bawer dike ku wateya wê gotinê "karker" e, an "xizmetkar" e an jî "koçer" e. Emê di sa vegêrinê.

Parçeyê 6 an, ji Karnamêgê çêra (behsa) şerekî dinê yê Erdeşîr dike, şerê ku li dijî Kirm-Xweday (Dêwê Gewre (an Gewreyê Dêw) kirî. Dibe mirov tiştên girîng di navên deveran de bibîne. Tê de çêla bajarê Kermanê tê kirin. Ev dihele em li ser vî navî bisekinin; ji ber ku carna ew gihandine gotina "Kurmanç".

Wê bidome

Nûnerê Welat-Sefkan li Almaniyayê li bajarê Bonnê bi hozan û dengbêjê Kurd Dilgeş re peyivî

'Ez dûr ketim te nabînim sebra dilan'

Hunermendên Kurd: "Wekî kodikeke vala ku deng jê bê, wekî din tu fêde nadin, ji ber ku tiştêkî nû nadin, geh ji Tirkî qopî dikin, geh yên Kurdî qopî dikin, yanî di neticê de, bi ziman dilîzin. Niha keçikek heye navê wê Şehrîbana Kurdî ye, helbesta Muxtaro dibêje, nizanim wekî din gelek helbestên din dibêje, Bijî bijî ARGK, lê nabêje Kurdistan dibêje gulistan, nabêje ARGK dibêje hevalno... Baş e kî hevalno?! Ez nabêjim bila nebêjin, bila rast û wekî ku hatine gotin bila bibêjin."

Hevalê Dilgeş ji kerema xwe re bu kurtahî hûn karin berî her tiştî ji bo xwendevanên me xwe bidin naskirin?

—Şeva we jî xweş û ya hemû hevalan. Ez li bajarê Nisêbînê di sala 1952 an de hatime rûdinê. Ji ciwaniya xwe ve min li gel hereketên Kurdî xebat dikir. Dîsa di xebata çandî de min karê xwe dikir, heyani 1982 an jî, hîn ez li gel KUK'ê bûm. Piştî berxwedana zindanan li bajarê Amedê, pîr û pîr hikariya wê li min bû, ji wê çaxê ve, min tîkiliyên xwe ji KUK'ê birrîn. Berxwedana Mezlûm û hevalên din baweriyê mezin li cem min çêkirin, ji lew re min kela Kurdistanê di PKK'ê de dît. Bi vî awayî domand heyani 1986 an, wê çaxê min qaseta Xanê çêkir, ji weşanên HUNERKOM'ê. Ji wê çaxê ve tîkiliyên min li gel HUNERKOM'ê çêbûn û heyani niha dom dike.

Ev e ku hûn ji 1979 an ve li derveyî welat in, gelo durbûna ji welat bi çî awayî tesîra xwe li ser helbestên we kir?

—Pirseke girîng e, mirov tu carî nikare welatê xwe ji bîr bike. Welat şîrîn e, xweş e, dûrî, xerîbî zindan e, nexweşî ye. Di welatê xwe de incex qîmeta mirov hebe. Li Ewropayê mirov dihele, dema ku şoreşgerê ji Ewropa derdikeve, mîna zêreki ku derkeve, ji ber ku zemînekî ku mirovan dihelîne ye. Hisreta welatê min, tu carî ji dilê min dernakeve. Di helbesta xwe de jî min aniye ziman, dema ku ez ji welat derketim, min wiha got:

Ez dûr ketim te nabînim sebra dilan

Ser soza xwe her dimînim sebra dilan

Mal û dil û can feda kim sebra xwe bistînim

Ji bîr nakim wan kanîka siya daran

Ji bîr nakim wan dostan wan hevalan... sebra dilan.

Dilgeş bi helbestên xwe yên li ser ziman hatiye naskirin, Muxtaro, Bêrivanê, Xanê û hwd. gelo sedem çî ye?

—Hozan bi helbestêkê tene naskirin, hene ku deh helbestan dibêjin. Lê ji nav wan dehan, yek tenê xweş e, dîsa jî bi wê tenê meşhûr dibe. Ê min ez dibêjim ku ez bi zimanê gel distrêm, sedem jî ew e ku gel zû wan helbestan jiber dike. Dîsa jî îslûba min ew e.

Hunermendê welatparêz, di vî demê de, girîng e ku çawa be?

—Mirov hene ku navê hunermendîtiyê li xwe dikin, lê ew û hunerê jî hev dîr in. Ew kes di dema ku gotina Kurd, Kurdî li cem Tirkan qedexe bû newêribûn bigotana, hinek jî hebûn ku digotin, hirmeta rabûnê "Zimanê me li hev digerin" û zimanê Kurdî difiroşin. Hunermendên welatparêz divê ku piştgirî û alîkarê partiya welatparêz be, partiya ku xelasiya millet dixwaze, ji bo millet xwînê dirijîne. Di vî rojê de li Kurdistanê şer heye, kuştin heye, tanq û tap û balefir diçine ser gelê me, eger em jî tenê Bavê Fexriya bêjin û li rewşê temaşe bikin qet nayê qebûlkirin. Bavê Fexriya jî kultura me ye, lê dema wê jî heye, dema moral bide gel, serhildan û rapêrînan bîne ziman jî dema xwe heye. Partiya welat-


parêz jî, ez vî rojê jî PKK'ê pê ve nabînim, ji lew re divê ku her hunermend alîkar û piştgirîya wê be. Çawa îro partîzanên me bi sîleha xwe şer dikin, gereke dengbêj jî, bi tenbûra xwe li ku dibe bila bibe, vî şerî bîne ziman. Hinek hene dibêjin girîng e ku hozan tu siyasetan negire, çima? Ma hozan ne însan e, nafikire, rastî û ne rastiye jî hev dernaxe? Belê, sedî-sed ew di kare li dijî cewtîtiyê şer bike, rastiye jî bide naskirin.

Hinek dengbêj derketine, tu çî ji wan re dibêji, ji ber ku tu fêde nadin gel, heyani ku helbestan şaş jî tînin ziman?

—Ez karim ve bêjim wekî kodikeke vala ku deng jê bê, wekî din tu fêde nadin, geh ji Tirkî qopî dikin, geh yên Kurdî qopî dikin, yanî di neticê de, bi ziman dilîzin. Niha keçikek heye navê wê Şehrîbana Kurdî ye, helbesta Muxtaro dibêje, nizanim wekî din gelek helbestên din dibêje, Bijî bijî ARGK, lê nabêje Kurdistan dibêje gulistan, nabêje ARGK dibêje hevalno... Baş e kî hevalno?! Ez nabêjim bila nebêjin, bila rast û wekî ku hatine gotin bila bibêjin.

Şoreşa serxwebûn û azadiyê li Kurdistanê gihîştîye merheleyeke pîr bilind. Hûn wekî dengbêjê Kurd, çawa li vî şoreşê dinêrin?

—Hemû hevîyên me vî roja şoreşa serxwebûn û azadiya Kurdistanê ye ku li bakurê Kurdistanê bi rê ve diçe, gavên gelek mezin hatine avêtin. Berê PKK li çend gundî digeriya heyani ku sîlehek peyda dikir, lê îro va ye sîleha me heye, gerilayên me hene, êdî PKK bûye gel, tirs nemaye. Heya ku dijmin karibe bila bête terorîst, gelek, miletek nabe terorîst, millet bawerîya xwe bi PKK'ê aniye, ketin êdî nemaye bawerîya xwe bi Serok aniye heya vî rojê me hîn serrokekî wiha di nav Kurdan de



Berga (qapaxa) qaseta Dilgeş a bi navê Xanê

nediye, gavên mezin di hêla leşkerî û siyasetî de hatine avêtin, rev jî nemaye, mirin jî nemaye. Şoreş pêşkêtiye, lê nayê wê maneyê ku em tenê vî gotinê bibêjin û hew, na ev şaş e, şoreş li ser piştî mirovên wekî me bi pêş dikeve, divê ku em jî bi hemû derfetên xwe alîkariya vî partiye, vî şoreşê bikin.

Me berî niha li Hunerkomê li qaseta we guhdarî dikir, helbestên nû, hûn niha tu amadekirinê ji bo berhemên nû dikin?

—Belê ew qaseta min a nû ye, hîn em tev hevalên Hunerkomê li ser disekin, ezê di, vî dema pêşîya me de vî qasetê diyarî gelê xwe bikim. Min hîna nav lê nekiriye, ji ber ku ez dixwazim tevli hevalên Hunerkomê navek jê re bibînin.

Tu gotinên we ji hunermendan re, ji xwendevanan re hene?

—Berî her tiştî, gotina min ji hozan û dengbêjan re ew e ku, divê êşa gelê xwe bibînin, barbariya dijmin bibînin û bînin ziman, pêşkêtiya partiye PKK'ê bibînin û wê bi tenê nehêlin. Em bi vî karê xwe di nava tîkoşinê de cihê xwe bigirin. Silavên min ên dilgermî, di serî de ji bo xebatkarên rojnameya Welat, Hunerkom û tevahiyê hunermend û dengbêjên Kurd ên welatparêz re hene û ez serkevtinê ji wan re dixwazim.

Spas hevalê Dilgeş.

—Spas xweş.

Berhemeke Kurdî ya bingehîn: Nûbar


Salar Amedî

Nûbar, bi qasî ku em zanin bi navê wê yê rastî Nûbihar, di 11'ê Adarê sala 1683 an de ji aliyê pisporê zimanê Kurdî, zan-yarê Rojhilata Navîn, mamosteyê nemir Ehmedê Xanî ve bi tipên Erebi hatiye nivîsandin.

Cara yekemîn jî di sala 1986 an de li Stokholmê Zeynelabîdîn Zinar ew ji tipên Erebi wergerandiye tipên Latîni. Di pirtûkê de jî pêşgotineke Zeynelabîdîn Zinar heye. Li ser jiyana Ehmedê Xanî, berhemên wî û naveroka Nûbiharê nivîsiye.

Nûbar bi taybetî jî bo zarokên Kurdan û hînkirina ziman hatiye amadekirin. Li ser vî jî Ehmedê Xanî di destpêka pirtûkê de wiha gotiye: "Ne ji bo sahibrewacan, belkî ji bo biçûkêd di Kurmancan".

Pirtûk scranscr bi helbestî û



Nûbar; 52 rûpel, weşanên Fîrat

kafiye hatiye nivîsandin û herwekî ferhengeke Kurdî û Erebi ye jî. Peyvek bi Kurdî an jî Erebi nivîsiye û li hember wê manîya wê ya Erebi, Kurdî nivîsiye. Wekî din di pirtûkê de hin şîrove, şîret û danasîna riya olî jî heye.

Herwekî berhemên Ehmedê Xanî yên din, Nûbar jî di çand û edebiyata Kurdî û tîkneçûyîna zimanê Kurdî de cihêkî wî yê gelek bi rûmet û girîng heye.

Ji bo hînkirina zimanekê, cara yekemîn Ehmedê Xanî bi vî rengî nivîsiye. Dû re hin kes xwestine bi vî rengî binivîsin lê belê nikaribûne binivîsin. Tiştê ku nivîsîna jî, ji texlîtê û wir ve neçûne; ji berê û heya demêkê nêzik jî, di medreseyan Kurdistanê de feqî, piştî Quranê Mewlûd û piştî Mewlûdê jî Nûbar dixwendin. Piştî Nûbiharê jî, hin pirtûkên din dixwendin. Lê feqiyek heya ku Nûbar xelas nekira nikaribû îcazeta melatiyê bistîne. Ev yek jî dibû sebêbê hînbûna ziman û edebiyata Kurdî. Gelek hozan û hunermendên Kurd, di medreseyan de xwendine. Girîngiya Nûbarê di vir de jî tê dîtin.

Klama Şêxê Zîlan


Xwedayê min zane, sê şahidê Mistoyê Hecî Quto/ Mêrê tifaq û teşqelan li dinyayê hene./ Bi sê dengan dikir gazî lo bavo/ Bi serê bavê te kim hê hê.../ Gava min îro serê xwe daye ser nişana mîrata elemanê/ Minê derba ewilî avêtiye bejna Mihemed Eminê Emer/ Çi bikim nivîs û qedder li ba rebê alemê bû/ Lê minê ji ber dilê wî pekandiye çavek ji çavê mîrata dûrebînê/ Derba du-duya minê daye li bejn û bala Remezane zava/ Zavayê salê yê nekemilî/ Derba sisêyan min daye li bejn û bala Yûzbaşiyê Suwariyê/ Lo bavo ji tafîl qeza ve guleyê min rast hatiye li çekî dewletê/ Wele min erê dewletê kuştiye, er guneh e / Çavê dê û xwişkên wî li rê ne/ Lo bavo ez bi serê bavê te kim eger tuyê/ Îro îzina min bidî ezê serê Girê Himê bikim cihê qelîn û birînê/ Newala Başimê bikim golek ji gola qetilwînê / Xwedayê min zane Şêxlerê min axayo hoo.../ De gulek ji mala Şêxayo, çiçeka mehkûm û firar û eşqiyayo hoo.../ Rextê mîrata elemanê çar tewq e li nav mîlano/ Canê Şêxê min nazîk e qayîşê milê Şêxê min kutayo.../ De nava şêxê min zirîc e, kezeba wî polayo/ Şêxê min destmala ser destê dostan, kelemê

nav çavên neyaroyo.../ Çi bikim kesekî îro di hewar û gaziya Şêxê min de nemayo.../ Lê li jorê hewar û gaziya Şêxê min Xwedê û

Bavê Fatimayo/ Lê li jêrê di hewar û gaziya Şêxê min de bê/ Şêx Mihemed Şêxê Quba Zîlayo/ Ez nemînim piştî bavê Şemsedîn

şêxlerê şexan kesekî di mala Zîlî de nemayo.

Berhevkar: Zana Farqînî



DENGBÊJ Û GIRÎNGIYA DENGBÊJIYÊ

Di nav me de toreyeke (adetekî) nivîskî hê nû belav dibe. Her çiqas di demên berê de li medreseyan ders dihat dayîn jî, lê di nav girseyekê teng de dima. Tenê kesên darsa olî (dîni) dixwendin dikaribûn tiştina binivîsin. Lê ew jî -bîlî çend kesên bi nav û deng ku berhemên gelek bi rûmet ji me re hiştine- tev li ser helbestan bûn û hema hema gişt jî, dîni bûn.

Ji ber van sebebên e ku em baş bi her awahî ve xwe nas nakin. Ne dîroka xwe, çanda xwe, hunerê xwe û ne jî pişê û tiştên ku di civaka me de qewimîne dizanin. Lê em bi tiştêkî dilşa ne ku dengbêj tu car jî nav me neqediyan. Heta ev dengbêjî bi xwe mijara (dabaşa) lêgerîn û lêkolînan e. Ji ber ku hem damezraweyê (sazgeheke) gelek kevn e û hem jî barê çandîya gel hilgirtine ser milên xwe, heta îro anîne.

Ev dengbêj bi aliyên xwe yên baş û ne baş ve cihêkî girîng di civaka Kurdî de distînin. Em dikarin dîroka xwe ya nêzîk bi taybetî jî serhildanên li dijî dewleta Osmanî, Ecem, Ereb û Komara Tirk ji van hîn bibin.

Em dixwazin bala dîrokzan û dîroknivîsên Kurd bikîşînin ser vê damezraweya dengbêjîyê. Bila li ser klamên wan jî bê rawestin. Bi tenê bi belge û wesîqeyên dewletên biyan ve girêdayî nemînin.

Ev klama jêrê ku li ser serhildaneke li dijî Komara Tirk hatiye gotin min jî devê dengbêjê gorbuhîşt Salihê Beynafi standiye.

Ev bûyer di sala 1926 an de qewimiye. Klam li ser Şêxên Quba Zîla hatiye gotin. Zîla gundekî ku bi navçeya Hezo (Kozluk) ve girêdayî ye. A.Kerim Zilan mebûsê SHP ji wê malbatê ye.

Semînerên lêkolînanê Kurdî li Sorbona nû Parîs III

16.12.1992: Zimanên Hind-Ewropî û rola zimanê Kurdî di lêkolînanê wan de (Pierre Lecoq, Dîrektore vekolanan li Zanîngeha "École Pratique des Hautes Etudes")

06.01.1992: Ronakbîrên Osmanî ku bi koka xwe Kurd in û guhertinên siyasî û civakî li dawîya Împaratoriya Osmanî (Musa Kaval, doktorê Zanînanê Siyasî)

13.01.1993: Kurdên Elewî li hember nasyonalîzma kemalîst, Serhildana Koçgiri di 1921 an de (Hans-Lucas Kiesser, vekoldar li Zanîngeha Bêle)

20.01.1993: Adetên pî-

roz li Kurdistanê: Ehli Heq û Qadirî (Jean During, Dîrektore vekolanan li CNRS; Jean Calmard jî, Dîrektore vekolanan li CNRS, wê beşdar bibe)

27.01.1993: Hewandina penaberên Kurdên Başûr li Tirkîyê (Sabri Cigerli, xwendekarê doktoriya Zanînanê Siyasî)

03.02.1993: Jin û malbat di civaka Kurdî de (Anne Viga, xwendekara doktoriya antropolojiyê)


10.02.1993: Sistema hînkirina tradîsiyonel berî avabûna dibistana li Kurdistanê (Musa Kaval, doktorê Zanînanê Siyasî)

03.03.1993: Raporên berpirsiyarên Fransîz, beşê leşkerî, li ser herêmên Kurdî di Împaratoriya Osmanî de di sed sala 19 an de (Paul Dumont, Profesor li Zanîngeha Strasbourg II)

10.03.1993: Jiyan û helbestvaniya Cegerxwîn (Mamo Cûmî, xwendekarê doktoriya wêje)

17.03.1993: Kurd û nexşa nû ya herêmê (Michel Bozdemir, mamoste li Amûjgeha Inalco)

24.03.1993: Sistema malbatîyê li ba Kurdan: Nimûna Hekarî (Hosham Dâwod, xwendekarê doktoriya antropolojiyê)



Nivîskarê Welat Mamo Cûmî jî, di 10'ê Adarê de li ser "Jiyan û helbestvaniya Cegerxwîn" semînerêkê dide.

31.03.1993: Herêma Mûsilê di dawîya sed sala 19 an de (Hesen Gökçe, xwen-

dekarê doktoraya dîrokê)

07.04.1993: Jiyan û berhemên Thomas Bois (Joyce Blau, Profesora li Amûjgeha Inalco)

28.04.1993: Dîroka sînoran di navbera Tirkîyê û Iraqê de (Soheyla Mamelî, xwendekara doktoriya dîroka pêwendiyên navneteweyî)

12.05.1993: Koyî: helbest û neteweyetî di dawîya sed sala 19 an de (Helkewt Hekim, mamoste li Amûjgeha Inalco)

Navnîşan: 13 Rue de Senteuil, 75005 Paris, Ci:Sal 129. Kate:16-18. Musa Kaval karê van semîneran dimeşîne.

Divê Zola çawa bê nirxandin?

Sitîla Zola berhema felsefeya ku ji senteza ronahîbûna sed sala 18 an û romantîzma sed sala 19 tê ye. Jixwe sedema ku romanên wî di nav romanên Ewrûpayê de cihekî girîng girtiye ji ev e. Hêza romanên Zola ji eyne girtina dinyayeke ku dihilweşiya tê.


Murat Ergin

Di edebiyatê de sazûmankarê Naturalîzmê nivîskarê romanên û rexnegirê Fransî Emîle Zola di sala 1840 an de li Parîsê tê dinê. Bavî wî bi eslê xwe muhendîsekî Îtalyan e û diya wî ji yeke Fransî ye. Zola piştî ku di sala 1859 an de lîseyê diqedîne qedere du salan bêkar dimîne. Di jiyana wî de ev herdu salên zor, paşî di nivîsandina romanên wî de jê re dibin malzeme. Di vê demê de tiştên ku hatin serê wî kir ku ji rewşa jiyana feqîran fêhm bike û li ser wan bifikire. Di 1862 an de, demekê di weşanxaneyekê de xebitî. Di 1865 an de romana wî ya yekemîn bi navê "Îtirafên Claude" derket. Ji ber naveroka vê romanê ku qala jîna qirêjî ya Parîsê dike, bala polîsan kişand. Weşanxaneyê ku lê dixebitî ew qewirandin. Piştî vê jî êdî Zola rojnâmevaniya serbest kir.

Zola bi romana xwe ya bi navê **Thérèse Raquin**, di sala 1867 an de bû xwedî şohreke mezin. Piştî vê Zola dest bi nivîsandina romana xwe ya **Rougon-Macquart** ku ji bîst romanî pêk tê, kir. Ji van romanên a pêşî ya bi navê "**Bilindbûna Rougon**" e (1871). 5 sal bi şûn ve tevî vê romanê jî 5 pirtûkên wî yê din ji hatin weşandin. Zola bi romana xwe ya bi navê "**Meyxane**" bû nivîskarê Fransa yê herî bi nav û deng.

Divê Naturalîzma ku Zola di berhemen xwe de afirandiye ji şert û rewşa jiyana wê demê cihê neyê fikirandin. Di nivê sed sala 18 yan de bi pêşveçûna zanyariya (bilim) dinyayê re û bi îcadên nû re nêrin û ditinên insanan ji binî ve guherîn. Zola nûnerê dema xwe yê tîpîk bû bi vî awayî. Di dema tê de dijiya (ss.19) Zola ditît ku di warê zanyariyê de riyên pîrr fireh li ber mirova-

hiyê vedibûn. Ji ber vî awayî jî dixwest ku di hunera wî de aliyekî zanyarîtiyê jî hebe. Zola dibêje ku gava mirov di berhemen xwe de behsa portreyê insaneke bike divê mirov karibe bi awayekî zanistî karaktera wî insanî şirove bike. Ev jî bo serpêhatina bûyereke jî wilo ye. Yanî bûyereke bi çî awayî dest pê dike, di çî rewşê de pêşve diçe û



Emile Zola (1840-1902)

bi çî şertan dawîya wê tê; divê ev tev bi metodên zanistî karibin bîn şirovekirin û ji wan bê fêmkirin. Di encama vê de Zola êdî wê hunera xwe ne tenê bi xeyalên xwe, ji aliyekî wê haya xwe bida ditinên xwe yê civakê û jiyaneke jî aliyê din jî wê bi alîkariya metodên zanistî hunera xwe pêk bihanîya. Ji bo Zola, hêjabûna berhemeke hunerî incax bi girêdayîbûna wê ya bi rastîyê ve, dibe.

Zola ji romanên ku bi vê ditinê bîn nivîsîn re dibêje romanên ceribandî (deneyesal roman). Bi vî awayî jî çarçoveya teorîk ya Naturalîzmê jî çêdike.

Zola di romana xwe ya ceribandî de dibêje ku, "Di vê sed sala ku em tê de dijîn, zanarî hatîye wê merhaleyê ku mirov kare tekamula (evrim) di tebiyetê de bi awayekî vekirî bibîne û hîn bibe. Romana ceribandî

ji encama vê tekamula zanistiyê ye. Romana ceribandî li şûna ku insanên di xeyalên mirov de dijîn, wê insanên ku di rastiya jiyaneke de dijîn de bîne zimên. Bi kurtahî romana ceribandî edebiyata çaxa zanyariyê ye ku em vêga dijîn."

Bi rastî jî Zola van fikr û romanên xwe di romanên xwe de bi kar anî û anî zimên. Di romanên xwe de tiştê jî destê wî hat nehişt ku tiştên xeyalî derbas bibin. Ji bo vê jî her car bala xwe baş dida hereketên insanan û bi çavekî zanistî bûyeran dinirxand. Çiqas vala dima, berhemen zanistî dixwend û not distand ji bo xebatên xwe yê mayî.

Romana Zola ya herî navdar, ya ku li ser jiyana fahişeyekê hatîye nivîsandin a bi navê "Nana" ye. Di romana xwe ya "**Germinal**" de jî li ser jiyana karkeran ên feqîr disekine û berxwedana wanî li hember şertên jiyaneke yê zor tîne zimên. Romana Zola ya bi navê "**Heqîqet**" bi nêrîneke laîk, dijberiya di nav dêrê ya doktrîna kevneperest û ekolana nû ku bi sed salan e li ber devê hev in, tîne zimên.

Ji ber dijminatîya Zola ku li hember Împaratoriya duyemîn a Fransa dikir, jî alî rexnegiran ve

wek mirovekî meylîdarê ramana çep dihat nirxandin. Lê îro Zola nivîskarekî şoreşger tê nirxandin. Ji bo danasîna ekola Naturalîzmê Zola, di gelek kovarên edebiyatê de nivîs nivîsand. Ji ber mijarên romanên xwe Zola jî alî mûhafazakaran ve bi mustehceniyê dihat sûcdarkirin.

Çavkaniya uslûba Zola ya ku jê re tê helbestên reş ji bawerî û hêviya dinyayekê û hatineke baş tê.

Wekî din jî sitîla Zola berhema felsefeya ku ji senteza ronahîbûna sed sala 18 an û romantîzma sed sala 19 tê ye. Jixwe sedema ku romanên wî di nav romanên Ewrûpayê de cihekî girîng girtiye ji ev e. Hêza romanên Zola ji eyne girtina dinyayeke ku dihilweşiya tê. Zola li pey xwe gelek roman hişt û di sala 1902 an de li Parîsê mir.

AZADÎ

Abdurrahman Durre



Qijika Belek

Di bêjin ku Qijika Belek meşa xwe neecibandîye, xwestiye ku weke Kewa Gozer bi rê ve here. Çendekî weke Kewê meşiyaye. Rojekî meşa kewê ji bîr dike û dixwaze weke meşa xwe ya berê bimeşe, lê bala xwe didê ku meşa xwe jî, ji bîr kirîye. Êdî ne weke Kewê dizane bimeşe û ne jî weke meşa xwe ya berê. Mecbûr dimîne cot-cot, çind-çind li xwe dixê û bi rê ve diçe. Ji wê rojê ve Qijika Belek meşa kevn û teze tev ji bîr dike û dibe pêkenîne a-lemê.

Bülent Ecevit jî, demekî bi İsmet Paşa re weke kemalîstan meşiya, dû re wê meşa kemalîstî neeciband û xwest ku weke çepan bimeşe, hê baş hîne wê meşê nebû dest avêt meşa guran, weke wan meşiya û hem jî bû çewke çewka wî û bi wan re zûriya. Çendekî jî bi yobazan re kire mire mir, xwest ku weke wan jî bimeşe, wê jî rind

pêk nehanî û kemalîzma xwe jî lewitand, çepîtiya xwe jî pê de rît, weke Qijika Belek bû pêkenîne a-lemê û çind-çind lê dixê. Dê hê çiqas bibe pêkenîk û riswa, Xwedê dizane.

Bi rastî ne ku tenê Ecevit bûye pêkenîk. Hemû polîtîkvanên Tirkîyeyê çirto virto bûne û weke Qijika Belek cot-cot lê dixin, bûne hebana virran û virr ji wan dibarin.

Serokkomarê muhterem Apê Turgut Özal jî, van rojan şop tevî hev kirine. Geh dixwaze weke Sultan Abdülhemîd bimeşe, geh jî weke Bush, geh dibêje: "Reheke Kurdan di min de heye", geh jî dibêje: "Siyaseta 'Güneydoğu' yê ez û Güreş Paşa dimeşînin û Demirel hay jê tune ye." Xebereke Kurdan heye, dibêjin: "Geh li nal dixê, geh jî li bizmar". Yılmaz jî tenbûra Lazan daye destê xwe û direqise, "ha uşak ha! Hamsi koydum tavaya başladım oynamaya". Hele Güreş Paşa; meşek wilo sosret dike ku li tu derê dinyayê meşeke wisa nebûye û nabe. Geh weke Demirel dimeşe, geh weke Çetin diheşe, geh dibirre, geh dikirre, geh kêfxweş e, geh vedireşe, geh dibêje: "Emê leşker bişînin Bosnayê", geh jî dibêje "emê bibin dostê Atî-nayê"... û hwd.

Serokwezîr jî, weke Temîr Axa* pesn û zirtên xwe dide, dibêje: "Ez serokê 24 eşîrên êla Oxuzan im, ji Çîne heta Viyanayê hikûmran im". Yanî dibêje: "Ez Siileymanê Tûran im".

Dodikê belengaz jî, şaş bûye û maye. Weke Dîkê gihê li dor Temîr Axa dizivire û direqise. Stûyê xwe yê leydanokî dibe û tîne, devê xwe qîç dike û disekine.

Xwedê çêke. Em çî bêjin. Çawa bûk û zava ye, wilo jî govend e.

*Temîr Axa: Li gundê Kanîspiya Dûtaxê bû. Digot: "Ez serokê 24 eşîran im, hemû axayên Kurdan di bin fermana min de ne.

Bülent Ecevit jî, demekî bi İsmet Paşa re weke kemalîstan meşiya, dû re wê meşa kemalîstî neeciband û xwest ku weke çepan bimeşe, hê baş hîne wê meşê nebû dest avêt meşa guran, weke wan meşiya û hem jî bû çewke çewka wî û bi wan re zûriya. Çendekî jî bi yobazan re kire mire mir, xwest ku weke wan jî bimeşe, wê jî rind pêk nehanî û kemalîzma xwe jî lewitand.

HEP ne PKK ye

Ahmet Baraçkılıç

Ev nivîsa me, bersiva rojnameya Welat ya hejmara 42 a nivîsa "HEP bi ku ve diçe?" ye.

Rewşa ku îro HEP tê de ye, hinek ne diyar û ne zelal e. Lê bi giştî rewşa HEP'ê piştî hîlbijartina 1991 an diyar û zelal bû. Kar û armanca HEP'ê û mebûsan bi bîngêhî eşkere bû, ger hinek mebûs di nav vî karî de cih negirtin, gor daxwazên gel kar nekirin, bi zanistî li gor menfaetên xwe û menfaetên mêtîngerên Tirkîkan xwe amade kirin, di vir de ne gunehê gelê Kurd heye, ne jî yê HEP'ê heye. Em wan mîna ku gel daye aliyek em jî bidin aliyek, ji ber ku gunehê wan bi rastî gelek giran e, haşa ker nikarin hilgirin.

Ji aliyê din ve, hinek kes û mebûsên di nav HEP'ê de cih girtine ne li gor daxwazên gel û demê, ne jî li gor plan û programa HEP'ê dimêşin li gor daxwaz û dilê xwe dimêşin. Di vir de bêbawerîbûn, tirs û dudilî û karyarîzm jî heye. Kesên wilo nikarin daxwaza gel bi cih bînin û ne jî dikarin gel bixapînin, pêwîst e rojekî zûtir bibin xwedî biryar.

Damezirandina HEP'ê bi daxwaza sazûmanên Tirkîkan û bi rêberîya Fehmî dest pê kir. Lê îro bi vî awahî berdewam nake, dem buhurî şert û şûrt guherîn. Êdî mirov nikare HEP'ê mîna destpêkê bibîne. Ji ber ku HEP bûye partiya Vedatan, Musa Anteran û bi dehan şehîdên demokrasîyê û azadîyê. Bê guman mirov nikare bibêje HEP'ê erk û delametên xwe bê kêmasî bi cih anîye, xwedî li daxwaza gel û xwedî li bira-

nîna şehîdan derketiye. Lê kes nikare bibêje HEP tiştê nekiriye an kêmasîyên wê ji başîyên wê pirrtir in.

Dema ku mirov li dîroka HEP'ê binêre, lêkolînê çêke, wê bê dîtîna çima rola xwe nelîstiye û bi ku ve diçe? Pêwîst e mirov damezirandina wê, berpirsiyarên wê û karkêşên wê bibîne û bi wan re êrîşên dijmin ên hovane jî bibîne. HEP ne partiya şoreşê ye ji bo wê jî nikare daxwaza gel bi cih bîne. Ji bo Komara Tirk bersîveke şoreşgerî pêwîst e, bersîveke wilo an bersîvên wilo HEP nikare hilgire, daxwazên gel pirr jî HEP'ê pêşvetir in. Van daxwazan PKK hilgirtiye, HEP ne PKK ye. Tiştên ku ji PKK'ê tene xwestin mirov nikare ji HEP'ê bixwaze. Bê guman tiştê ku ji HEP'ê tene xwestin gelek in, pêwîst nake em bi rêzîbîkin, rojnameya Welat ji van hinekan rêz kirine û rexne jî kiriye. Ez rexneya rojnameyê bi pirranî napejirînim.

Rojnameya Welat, HEP'ê mîna partiyekî şoreşê dibîne û bi wê nêrînê rexne dike, vê ramanê jî bo rojnameyê kêmasî dibînim û di rexneyên xwe de zimanê ku bilêv kiriye ne layiqî rojnameya Welat e: Mîna gotina serserî û hwd. ger ji bo kesan hatiye gotin jî pêwîst e ji partiyê bête cudakirin ji partiyekê re (mîna HEP'ê) wilo nayê gotin.

Têbîniya Welat:

Peyva ku di Rojewa hejmara 42 an de hatiye bikaranîn ne "serserî" ye. Peyv bi xwe "sersarî" ye û di wateya "di xwe re ne dîtîna, cidî negirtin" û hwd. de, hatiye bikaranîn.

Sosyaldemokratên Almanya û Kurdistan

Yekda Welat

Serokê Koma Meclîsa Partiya Sosyaldemokratên Almanya (SPD) Ulrich Klose gelê Kurd nas nake û dîsa jî tevgera serxwebûn û azadîyê bi navekî terorîstîyê diyar dike.

Serokê Koma Meclîsa Partiya Sosyaldemokratên Almanya SPD di vê salê de çû Tirkîyê û li vê derê bi fermî piştgirtîya "demokratiya Tirkîyê" kir û têkoşîna rizgariya neteweya Kurdistan bi navekî terorîstîyê diyar kir. Di wan rojan de jî pirr hevpeyvînan Klose di rojnameyên Tirkîkan de derdikevin. Di wan hevpeyvînan de Klose dibêje ku guman heye PKK malê tevzandîne (uyuşturucu ticaretî) difroşe û PKK rêxistinê terorîst e. Lewra jî Klose dibêje ku mafê Tirkîyê heye, ku xwe li dijî terorîstan biparêze. Klose di hevpeyvînan xwe de wiha dibêje: "Min got ku Tirkîyê li dijî terorîstan derkeve, hiç mirov deng nakin... Dema ku ez hatim Tirkîyê min got ku PKK rêxistinê terorîst e."

Ku mirov li dîroka SPD li Almanya mêze bike, her dem reformîstî û antî-şoreşî hebû. Dema ku Hitlerê faşîst li Almanya serwest bû, SPD tenegehîşt ku li dijî faşîzmê berxwedaneke rêxistinî bike û bi hezaran endamên SPD di girtîgehên de mirin. Lê hinek jî wan wek Willy Brand, ku vê salê çû gorê, ji derveyî welat li dijî faşîzmê kar kir û lewre jî li cîhanê bûbû mirovekî bi nav û deng.

Ku têkoşîna rizgariya neteweya Kurdistan terorîst be, Willy Brand jî di dema Hitler de terorîst bû.

Ji xwendevanên Welat re hewce nake ku were îspatkirin li Kurdistanê kî terorîst e û kî ne terorîst e. Lêşkeriya Tirkîyê pirr azînen (metod) faşîzma Almanya jî xwe re girtiye. Azînen hingavîne (iş-kence) heta dîsîplîna leşkerên Preuz-Al-

manya jî xwe re girtiye. Lewre divê Klose bi xwe li gotinê xwe baş xwedî derkeve. Her roj kargehên Almanya çekan difiroşin Tirkîyê û SPD çavê xwe digire. Tanq û topên Almanya zarok, jin û kale-pîrên Kurdan dipêçînin, dikujin û SPD bê deng dimîne. Mirov dikare bê dawî nimûneyan li ser hevalbendîya Tirkîyê û Almanya ku li dijî gelê Kurd derketiye bi rêz bike. Ev nimûne jî generalê Alman Moltke di sed sala 18 an de dest pê dike û heta îro ku Almanya eşkere li dijî têkoşîna rizgariya neteweya Kurdistan derdikeve didome. Nimûneya dawî ya wan rojan ev bû ku dewleta Almanya dixwest hîlbijartina Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê birawestîne. Lê ne SPD û ne împeryalîzm giştî dikarin gelê Kurd ji daxwazên vê yê serbixwe û azad dîr bikin.

Wek di wan nimûneyên kin, yê jorîn de, hate diyarkirin ku Klose û Partiya wî SPD li ser konevaniya Kurd û Kurdistanê ramanê şaş û xelet dimeşîne. Ev bûyera SPD û gotinên Klose jî bo mirovahîyê pirr şerm û fedî ye. Tiştên ku Klose di hevpeyvînan xwe de dibêje, jî rastîyê pirr dîr in û bê guman Klose wan agahîyên xwe ji dewleta Tirkîyê distîne û lewre jî rewşa Kurdistanê û PKK xelet analiz dike. Bila SPD jî baş bizanibe ku li Almanya pirr mirovên Kurd bûne endamê SPD û ev Kurd wan gotinên Klose napejirînin. Bi sedan îro mirovên Kurd li Almanya ku endamên SPD'ê ne li ser derketina endametiya xwe difikirin (dihizirin).

Ku Partiya Sosyaldemokratên Almanya (SPD) li navê xwe, li Karl Liebknecht, Willy Brand û hwd. xwedî derkevin, divê gotinên xwe yê terorîzmê li ser PKK paşve vegeirînin.


Mafê tu kesî nîn e ku gotinên reformîstî û paşverû li er tevgera şoreşê jî bo demokrasîya gelê Tirk û Kurd bike.

XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zîlanî

Çeperast: 1-Stranbêjê Kurd a bi nav û deng. Bi stranên xwe yê gelêrî li hemû Kurdistanê tê naskirin û hezkirin. Di wênê de tê dîtîna/ Xwarinek, ji şîr çêdibe
2-Gerdûn/ Organeke hundirîn
3-Kincên ji rîs çêdibin/ Mûyên ji pez tene girtin
4-Helbest, şîr/ Qebile, êl
5-Kevirê giranbuha/ Rivîneke firok/ Notayek
6-Wek/ Kinçek bê mil, di bin saqo de tê lixwekirin
7-Cejn/ Li Mezopotamya navê bajarvaniyê kevin
8-E-razî, ax/ Tûr
9-Mînak, wekok
10-Notayek/ Hêşinahiyek.

Serejêr: 1-Aborî/ Di notayê de dema seknê
2-Bi Almanî 'erê'/ Nexweşînek
3-Navçeyek girêdahiyê Sêrtê/ Sembola Rûbîdyûmê
4-Beşek ji milê mirov/ Daçek
5-Di erebeyan de beşa ceryanê/ Xwarina sewalan/ Bi lez
6-Pêşeroj, wêbê/ Li Serhedê bajarekî Kurdan, di nav tixûbên Ermenîstanê de maye
7-Milet
8-Celebekî qawin
9-Xwarineke Kurdî, ji mast, nok û genim çêdibe
10-Ar, şewat
11-Qaf
12-Celebekî qumaş.



BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÛYÎ

Çeperast: 1-Sebrî Botanî 2-Îran/ Erzî 3-YNK/ Îr/ Sason 4-Akustîk/ Dama 5-Ra/ Tevîn 6-Em/ Trafo 7-National 8-İlm/ Nt 9-Dr/ Arda 10-Pêkenî
Serejêr: 1-Siyabend 2-ERNK/ Ma/ Dê 3-Bakur/ Tirk 4-Rn/ Satil 5-Ît/ Roman 6-Berîtan/ Rî 7-Or/ Kefand 8-Tas/ Voltaj 9-Azadî 10-Nisan 11-Om 12-ANAP

KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiye razînin:

Li Tirkîyê û li derve: Y. Serhat Bucak

İş Bankası Çağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopiyêke pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

Navnîşana Welat: Başmusahip Sok. Talas Han 16
Kat:3 No:301 Çağaloğlu /İstanbul

Tel (fax): 512 12 87

Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM

Di demekê de, pisîng û mirîşkê hebûn. Her du bûn xwehên hev. Rojekê, pisîngê gote mirîşkê: "Ezê herime serê xanî û gundor bigindirînim." Pisîngê baz da û çû serê xanî gundor gindirand. Lê di bin gundor de ma û mir. Gava mirîşk çû dît, pisîng di bin gundor de maye û mirîye, wê jî dest avêtin keziyên xwe û ew jêkirin. Bi dû re berê xwe da ber bi malê. Qijîk jî hat nik wê û jê pirsî:

-Çima tu kezî kur î?

Mirîşkê bersiv da û got:

-Ez kezîkur, xweha min pisîng, îro di bin gundor de ma û mir.

Qijîkê jî dûvikê xwe kişand, firî û çû serê darê. Darê jî qijîkê pirsî û got:

-Çima tu dûvkişên î?

Qijîkê lê vegerand û got:

-Ez duvkişên, mirîşka me kezîkur, xweha me pisîng, îro di bin gundor de ma û mir.

Darê jî pelên xwe bi ser avê de weşandin. Avê ji darê pirsî û got:

-Çima tu pelweşên î?

Darê got:

-Ez pelweşên, qijîka me dûvkişên, mirîşka me kezîkur, xweha pisîng, îro di bin gundor de ma û mir.

Hilbijardeyek ji çîrokên gelêrî:

Pisîng û mirîşk



Avê jî xwe di ser garis de şilo milo kir. Garis ji avê pirsî:

-Çima tu şilo milo yî?

Avê bersiva gêris da û got:

-Ez şilo milo, dara me pelweşên, qijîka me dûvkişên, mirîşka me kezîkur, xweha me pisîng îro di bin gundor de ma û mir.

Gêris jî serê xwe tewand. Xwediyê gêris hat û jê pirsî:

-Çima tu sertewên î?

Gêris li xwediyê xwe vegerand û got.

-Ez sertewên, ava me şilo-milo, dara me pelweşên, qijîka me dûvkişên, mirîşka me kezîkur, xweha me pisîng, îro di bin gundor de ma û mir.

Xwediyê gêris bi hêrs ket, rabû û çû marek girt û li piştta xwe gerand. Pişt re keça wî hat ba wî. Sîfîlek mast pê re bû. Dema ku wê rewşa bavê xwe dît, lê vegeriya û pirsî:

-Yabo, çima tu mareqûn î?

Bavê keçikê bersiva wê da û got:

-Ez mareqûn, garisê me sertewên, ava me şilo-milo, dara me pelweşên, qijîka me dûvkişên, mirîşka me kezîkur, xweha me pisîng, îro di bin gundor de ma û mir.

Keçikê jî mast bi serê xwe de kir û çû malê. Dema ku diya wê ew dît, jê pirsî û got:

-Keça min bêje, bi çima ti serbimast î?

Keçikê bersiva diya xwe lê vegerand û got:

-Ez serbimast, bavê min mareqûn, garisê me sertewên, ava me şilo-milo, dara me pelweşên, qijîka me dûvkişên, mirîşka me kezîkur, xweha me pisîng, îro di bin gundor de ma û mir.

Diya keçê jî rabû û li ser sêla sor rûnişt. Cîrana wê hat û jê pirsî:

-Lê cîranê, çima tu qûnbisêl î?

Wê, ji jinika cîran re got:

-Ez qûnbisêl, keça min serbimast, mêrê min mareqûn, garisê me sertewên, ava me şilo-milo, dara me pelweşên, qijîka me dûvkişên, mirîşka me kezîkur, xweha pisîng, îro di bin gundor de ma û mir.

Cîranê jî çî tu tiştêk tînegiha. Benekê ji xwe anî û ji kerban, xwest xwe bi dar veke.

Çirok bo minalan (Sorani)

Kiçoley kilaw sor

Carê le caran kiçoleyekî biçkolane hebû û legel dayik û bawkiya le naw daristanêkî gewreda dejiya. Ew hemîşe kilawêkî sorî leser bû, leber ewe be kiçoley kilaw sor nawî derkirdibû.

Rojê le rojan kilaw sor wîstî serdanî dapîrey bikat, ke le xanûyekî naw daristanêke dejiya. Leser rêgada çawî be gurgêkî gewre kewt. Gurgeke lewî pirsî be temay kiwê bûy, ewîş le weramda wîfî kedewîst bicête lay dapîrey xoy. Gurgeke zor

be pele ew nawçeyey becê hêşt taku le pêş Kiçoley kilaw sor xoy bigeyênête lay dapîrey ew.

Gurgeke çuwe naw xunûweke û dapîrey Kiçoley kilaw sorî xward.

Le paşan da cilubergî şewaney ewî le xo kird û le cêy lêy xewit. Gurgeke lêwênderê çawerwanî kiçoley kilaw sorî kird.

Katê Kiçey kilaw sor geyişte ewê, dipîrey xoy gelê seyir hate ber çaw, leber ewe pirsî.

"Dapîre boçî çawekanî wa gewren?"

"Gurgekeş le şwênî razana wîfî:

"Taku be tewawî to bidînim" Kiçey kilaw sor wîfî:

"Dey kewate leber çî giwêçkekanî ewende gewren?" Gurgeş wîfî:

"Taku be tewawî giwê le to bigrim" Le kotayîda Kiçey kilaw sor pirsî: "Belam borçî demêkî wa qewret pêwe ye?" Încê gurgeke wîfî: "Taku te bixom", le nakawê da pîrî daye Kiçoley kilaw sor û xwardî, le paşan lêy nûst û destî kird be pîrxê pîrx.

Diway maweyekî kem rawçiyek hate nêw daristanêke û pîrxê pîrxî gurgekey bîst û le dilî xoyda wîfî: "Lew denge seyrey! "Le paşan biryarî de biçête nêw xanûwekewe û temaşay nawewey bikat. Ber her corê bû gurgekey le naw textî xewa bedî kird. Rawçiyeye gurgekey kuşt, le diwayîda meqesêkî hêna û wîrgî gurgekey dirrî. Lew kateda kiçoley kilaw sor û dapîrey ew hatine derewe û be yektira şad bûnewe.

Mehabad Kurdî

Zimanê Kurdî

Bi xeml û rewş e,
Şîrîn û xweş e,
Zimanê Kurdî.

Bi nexş û awaz e,
Lefîf û naz e,
Zimanê Kurdî.

Gewgewê çyan e,
Kubra Kurdan e,
Zimanê Kurdî.

Rist û helbest e,
Şemdana dest e,
Zimanê Kurdî.

Beyta feqî ye,
Dengê Xanî ye,
Zimanê Kurdî.

Şikoyê Hesên

Kultura Kurdî li ser çî bingehî rûdine?

Ş.Cizîrî: Divê em mesela malê Kurdan, an ne malê Kurdan, piçek vekin. Di kultura Kurdan de çî malê Kurdan e û çî ne malê Kurdan e? Du aliyên kulturê hene. Yek jê aliyê madî ye. Wek teknoloji... Teknolojiyê her kes digirê û ji xwe re bi kar tîne. Lê, em li vir li aliyê sosyolojîk dinêrin û li ser wê munaqesê dikin. Yanî danûstandina mirovan e. Exlaqê civakî û siyasî ye. Yanî bi gotineke din mesele îdeolojî ye. Heger dîn ne kultura Kurdî be, wê demê em dê ji yezîdîyan re bibêjin çî? Kurd heye ku ji xwe re dibêje ez Kurd im lê, ez Kurdê cihû me. Kurd heye fileh e. Kurd heye musulman e, şîî ye. Heger mirov dîn ji fenomena kulturê derbixe, dê maneya kulturê vala û çewt bimîne.

A.Tigrîs: Baş e, mesela ziman ji wek a dîn e. Mesela çend dewletên cihê bi emî zimanî dipeyîvin. Gelek edetên wan jî wek hevûdu ne. Wek Îngilîz, Kanada. Amerîka bi Îngilîzî û pirraniya dewletên Amerîka Lafînî jî bi Spanî dipeyîvin. Hûn jî wê yekê re dibêjin çî?

M.Mayî: Heger ziman yek be, ev naye wê maneyê ku kultura wan yek e. Ziman, ji binyata neteweyekê tê. Dîn bawerî ye. Bi bawerîya min, mirov nikare bibêje dema ziman yek be, kultur jî yek e. Na!

Ş.Cizîrî: Ziman ji kultur a stûneke. Ji elementan yek e. Lê, bi serê xwe mirov nikare gotina kultur dabixe sewiya ziman. Heger mirov munaqeseyekê li ser kultura Kurdan bike, dê wê demê gelek asteng derbikevin pêşiya Kurdan. Kulturê heremî jî hene. Wek kultura Badîni, Serhedî, Botî... Lê, kulturek jî heye ku, ya netewe ye. Mesela hinek tiştên cihê yên Botî û Badîni hene. Lê, dema ku mirov bibe neteweyek, divê zimanekî mirov hebe. Ew ziman hinek norman dide mirov. Wek bi riya perwerdekirin, dibistan, çape-menî... Tarîxekî tevî çêdike. Qad û çarçoveyek, ji tarîxa Kurdî re çêdibe. Di vir de, dewletbûn roleke mezin û merkezi dilîze. Mesela gelek kesên me îro dibêjin ku Mem û Zîn edebiyata me ya klasîka hemû Kurdan e. Lê, ew parçeyekê ji edebiyata me ya klasîk e. Ji ber ku dewleta Kurdan heta niha nehatiye damezirandin, kultureke hevgerî ya neteweyî jî çênebûye. Kultura Kurdan, ên ku hene heremî ne. Dema dewlet çêbibe, dê wê demê hinek sembolen neteweyî çêbibin. Nedewletbûna Kurdan, anarşîzmê jî xistye nav kultura Kurdan. Kultura Kurdan belavkirî maye. Ji ber wê yekê jî, îro kultura Kurdan a heremî ye.

A.Tigrîs: Ji ber ku dewleta Kurdan çênebûye, ji ber wê yekê jî gelek zarava û devokên Kurdî hene û di wî warî de gelek problem hene. Zimanê nivîskî bi salan qedexeyê bûye û Kurdî bi devkî maye. Kek Mahfûz, gelo qedexebûna zimanê nivîskî tesîreke çawa li ser ziman û kultura Kurdî kiriye?

M.Mayî: Nedewletbûna Kurdan, li ser kultura Kurdî tesîreke negatîf kiriye. Heger dewlet hebûya, dê niha zimanê me yê nivîskî yê yekgirtî jî hebûya. Bi rastî wek heval jî got berhemên Kurdî yên hêja di nav gel de bi devkî mane. Ehmedê Xanî bi Mem û Zînê nedewletbûnê da diyarkirin. Ew kula dilê Ehmedê Xanî ye ku dewleta Kurdan tune ye. Paşvemayina me, ji tunebûna dewleta me tê.

Ş.Cizîrî: Dewlet dikare hinek

nezan berhev dike û bi wan li ser ziman xebat dike. Lê, li Kurdistanê gelek mirovên zimanzan hene ku yek wan li der nas nake. Belê dewlet ne nivîskar e, lê ew dikare dezgehê çêbike û ji nivîskaran re îmkanan pêk bîne. Wan organîze bike.

Ş.Cizîrî: Ez naxwazim dewlet ji min re bibêje ku ez difroka çawa binivîsim an jî helbestekî çawa binivîsim. Heger dewlet emir bide û bibêje tu dê wê yekê wiha binivîsi, ez li dijî wê yekê me. Dewleteke wisa dewleteke çavsor e. Lê, mameste tu di wî warî de çî dibêji?

A.Tigrîs: Bi dîtina min bê dewlet tiştêkî bi rêk û pêk çênabe. Her tişt bi dewletê ve girêdayî ye. Ma têkoşîna me hemû ne ji bo damezirandina dewleteke Kurdî? Ji ber ku dewleta Kurdan tune,

kesên hejar, kesên xizan mecal nedîtiye ku kultura xwe formûle bikin. Yanî kultura gelê Kurd, heta niha baş nehatiye formûlekirin. Edebiyat jî aliyê mala Bedirxanan ku ew mîr bûn ve hatiye nivîsandin. Rast e, Bedirxanan jî bo kultura Kurdan xizmeteke mezin kirine, lê ku ew kultur a mîran e. Yanî kultura Mîrê Botan e. Kultura Mîrê Botan, ne kultura xelkê Botan e. Yanî ne ya xebatkar û cotkarên Botan e. Lê, hinek tişt hene ku ew neteweyî ne. Wek ala Kurdan. Lê, gelek danûstandinên Kurdan ku hene, gelek norm, nirx hene ku ew jî dikevî nav kulturê, lê ew çîni ne.

A.Tigrîs: Ji kîjan alî ve? Mesela ji aliyê xwarin, rabûn, rûniştin, edet, çawa?

Ş.Cizîrî: Belê, mesela rabûn


sa ya Kurdî ye. Lê, ji hinek herêman tiştên guhertin. Mesela li hinek herêman xwarinê bi dest dixwin, li herêmeke din bi kevçiyên dixwin. Bi dîtina min ev kultura heremî ye. Dema em tîr ser ya dewlemendan ev nîşana kultura Kurdan bi xwe ye.

Ş.Cizîrî: Gotina kultura çîni tune, ne rast e. Li her derê dinyayê çîni serdest û bindest hene û herwiha li Kurdistanê jî çîni û qad hene. Lê, wek min bawerî jî got, hinek tişt hene ku neteweyî ne û hemû Kurdan digihînin hevûdu, lê hinek tişt jî hene ku hemû kesên nagihînin hevûdu. Mesela zimanê Kurdî yê hemû Kurdan e. Malê tu çîni û qadî nîn e. Lê, gelek normên me hene ku li gor çîni û qadan tîr guhertin. Carek jiyana me ya pratîk ne wekhevûdu ne. Hejarên Kurd û dewlemendan Kurd ne wek hevûdu dijîn. Ev tiştêkî eşkere ye. Ez bi xwe hevalbendên kultura xelkê me. Lê, yên ku kultura mîrekan wek Mem û Zînê tînin ziman jî, li ser çavan. Lê, ew norm û edetên mîrekan in. Gelo çima Mem û Zîn li Cizîra Botan çêbû? Ji ber ku li herêma Botan desthilatiya mîrekî xurt bû.

M.Mayî: Belê, ez jî dibêjim kultura dewlemend û ya hejaran heye, lê hemû kultura Kurdî ye. Yek jî, ji kultura Kurdî ye ku di nav Kurdan de axa hene.

A.Tigrîs: Mirov dikare bibêje li gor çîniên Kurdan kultura Kurdan heye? Mesela wek heval Şerfexan jî got kultureke me ya hevbeş heye. Wek axa, ziman, al, hîsên neteweyî, manevî, edetî tevlî hwd. Ev tişt jî bo hemû Kurdan e û em di van tiştan de dibin yek. Niha mirov dema li kultura Ewropî ya kevne mîze dike, dibîne ku hema hema hemû wek a çîni serdest bûye. Ew bajarvaniya ku maye, wek qesr, qonax, avahiyên kevne, muze, kanî, pird (pir) û hwd. hene. Hûn dibêjin ew ji kîjan çîni mane?

Ş.Cizîrî: Birca Belek ku Mîrê Botan li Cizîra Botan çêkiribû û xaniyê Xelîlê Mîsto ku li Omerîyan e, ne wek hevûdu ne. Divê mirov wê rastiyê qebûl bike. Qesrê Mîrê Botan û xaniyên gundiyeke Botî tu carî ne wek hevûdu hatine çêkirin. Jixwe jiyan civakî, mirov bixwaze nexwaze hinek newekheviyan bi xwe re tîne. Ev newekhevî jî, ji jiyana çîniyeyî ye. Hebûna çînan nîşan dide ku civaka Kurdan civateke jîndar (zindî) e. Dema kultura çînan tune bin, wê çaxê civaka Kurdî wek civakeke mirî ye. Dibe ku serdest û dewlemendan me bibêjin, "Hemû Kurd wek hevûdu ne."



tiştên teknîkî hel bike. Mesela yekîtiya alfabe û ziman. Programa perwerdeya dibistanan. Lê, dewlet nikare hemû problemên me hel bike. Dewlet ne nivîskar e. Dewlet ne difrokan e. Dewlet tiştêkî nîn e. Ên ku dewletê çêdikin insan in. Heger em wek rewşenbîrên Kurd wezîfeyên xwe neynin cih, li ser ziman, edebiyat, difroka û kultura xwe nexebitin, dewlet nikare tiştêkî bike.

M.Mayî: Ew tiştên ku tu dibêji gelek ji wan rast in, lê dewlet dikare dezgehêkê çêbike. Niha Enstîtuya Fransayê, li der hinek kesên

em dev ji ziman û kulturê berdîn, mafê hebûn û jiyana Kurdan nîn e. Dewlet pêwîst e. Ma çima ziman, edebiyata Kurdan pêş neketiye? Ji ber ku dewleta Kurdan tune bûye. Dewlet van kar û baran organîze dike. Îmkanan çêdike.

Dîtinek heye ku di nav her neteweyî de li gor çîni (siniif) û qadan kulturê cihê cihê hene. Gelo ev tişt jî bo kultura Kurdan jî mirov dikare bibêje?

Ş.Cizîrî: Rast e, pirseke gelek di cihê xwe de ye. Dema mirov dibêje kultura Kurdî, ya çîna serdest hatiye formûlekirin. Yanî

û rûniştina kesekî mîrek, bazirganeke Kurd, dewlemendekî Kurd û rabûn û rûniştina gundî an jî xebatkarekî Kurd ne wek hevûdu ne. Herwiha xwarin û vexwarinê mîrek û gundî, xezanan jî ne wek hevûdu ne. Cil û berg jî, ji hevûdu gelek cihê ne... Stran jî ne wek hevûdu ne. Bi awayekî din in. Mesela stran hene yên xelkê bi xwe ne û stran hene ku wesfê mîrekan didin. Wesfê axan didin.

A.Tigrîs: Baş e, ma ev ne jiyaneke cuda ye?

M.Mayî: Na, ev kultura Kurdî ye. Yanî ya axa û ya xizanan jî di-